


Rapora Qetlîama Gerê (Çevrimliyê)

"Heyeta me tespît dike ku di demeke ku Konfêransa Ewlekarî û Hevkarî ya Ewrûpa dom dikir pêkhatina bûyereka wiha noxteyek tarî ya gelek girîng e ku divê li ser bê fikirin"



Di 10'ê Heziranê de li gundê Gerê (Çevrimliyê) qetlîamek mezin çêbû, 27 kes hatin kuştin ku piraniya wan zarok û jin bûn. Dewletê nehişt ku rojnamevan herin xwe bigihînin gund, lê îdîa kirin ku PKK'ê ev kes kuştine. Derket ku ji yê kuştî 4 jê "korucu" lê yê din kesên neçekdar ên bêguneh in. Bi vê re PKK ji îlan kir ku 4 korucu ji bal wan ve hatine kuştin lê haya wan ji sivilan tune. Lê belê buyer yek bû û di şevê de pêk hatibû. Dawiyê di nav gel de bela bû ku, destê dewletê bi xwe di vê qetlîamê de heye. Heta Dr. İsmail Beşikçi di mahkemê de da diyarkirin ku MÎT'ê ev insan kuştine û buyer protesto kir. Li jêr em rapora heyetekê çapdikin ku ji Kurdan û kesên pêşverû yê din pêk hat û çû li gund bi xwe geriya.

Di tarîxa 21'ê Hezîrana 1990'î de heyetek ji 30 kesan pêkhatî ku Serokê Partiya Sosyalîst Ferit İlsever û endamên Heyeta Serokatiyê, Serokê Komela Mafên Mirovî ya Diyarbekir Hatip Dicle û endamên Komsîsyonê, Serokê Komela Mafên Mirovî ya Sêrtê Av. Zubeyr Aydar, li ser navê Baroya Diyarbekirê Av. Fethî Gumuş û mensûbên rojnamevanên tê de bûn, li gundê Gerê (Çevrimliyê) lêkolînek çêkir. Her çî di eynî rojê de tespîten heyetê ji bo çapemeniyê hatin eşkerekirin jî, ji ber sedemên sansura ku bi qerarnama dawiyê hat danîn, nuxtên tarî yê buyerê ku li jêr hatine tespîtkirin, negihîştin raya giştî.

1- Ketina gund a endamên çapemeniyê ancax 11 roj piştî buyerê bi vê heyetê re pêkhat. Xwedêgiravî bi bahana "ewlekariyê" rênedana rojnamevana ku têkevin

gund, em di wê baweriyê de ne ku nuxtek ji yê herî tarî yê vê buyerê ye ku divê bê ronîkirin.

2- Hat tespîtkirin ku sê roj berî ku heyet tekeve gund, gundiyan Çevrimliyê li gundê Koçyurdu (Bizênê) hatine bicîhkirin, loma heyet pêşiyê çû vî gundî. Ji ber rênedana hêzên leşkerî yê gund û "koruyuciyên gund" (milîsên cahş N.A) diyalogek bikêrhatî bi gundiyan re nehat danîn. Heyeta me tespît kir ku civîna ku Qumandarê Alayîya Cendirman (rojê berê hatibû gund) Waliyê Sêrtê (ku siba wê rojê hatibû gund) û Bahattin Altuğ (Baho Axayê) serokê Herêmî yê "koruyucuyan" ku bi gundiyan Çevrimliyê re kirin, tesîrek gelek mezin li ser gundiyan kiribû ku ji heyetê hatin tecrîdkirin. Bi taybetî, ew êrişên heqaretwarî yê ku koruyuciyên gund anîn ser heyetê plan û tertîp

bûn.

3- Li Çevrimliyê (ku heyet dawî yê çû wir) îfada çend gundiyan ku alavên xwe kom dikirin gelek balkêş e. Li gor îfada gundiyan ku xwestin em navê wan veşartî bihêlin, yê ku qetlîam kirin li ser wan derpiyê kinik, atlê û êlekên fişekan hebûn. Ji bilî çar korucuyan zarok û jinên masûm ku hatin kuştin hemû ji zarok û merî vên wan kesan e ku kuroyucî, (cahşî) qebûl nekirine û ji bo kar çûne İzmîr û Stenbolê. Umer Beştasê 15 salî ku di qetlîamê de hatiye kuştin her çî gotiye: "Hûn bi xatirê Kurdistanê dikin min nekujin, ez jî dixwazim tevî we bim" qatilan gotine "Em di Kurdistanê n..." û ew gulebaran kirine. Hê balkêştir e ku Umer Beştas ji malekê ye ku korucî qebûl nekiriye.

4- Miharebe ji 21.00'ê êvarê heta 03.00'yan bi navber dom kiriye. Tîmên Taybetî (Kontr Gerilla N. A.) yê ku li gundê Koçyurdüyê, bi peyatî 15 deqe duri gundê Çevrimliyê dimînin, Tabûra Cendirmên Komando ya 9. bi peyatî seetek duri gund û gundê Korucubashi Baho Axa li herêmê ye. Tevî vê jî tu mudaxele li buyerê nehatiye kirin. Ev nuxteyek tarî ye ku divê bê lêkolîn ji ber ku seetekê piştî rawestana tiwîngan roj hilatiye û dinya ronî

Dûmahîk: r. 11

Helsînkî Watch li ser Tirkiyê raporek nuh hazir kir:

"Dîvê Qerarnama 413'a Rabe"

Helsînkî Watch di meha Heziranê de li ser Tirkiyê raporek nuh belav kir. Ew di rapora xwe de li gel gelek daxwazên konkret, gelek rexnên giran ji li Tirkiyê digre.

Wezîfa Helsînkî Watch ewe ku çavdêriya DYA û ew welatên din ên ku Peymana Helsînkî îmze kiribûn, bike ku ka ew li gor prensîbên Peymanê hereket dikin ya nakin. Di serê meha Gulanê de Helsînkî Watch û Komîta Helsînkî ya Danîmarka bi hev re heyetek şandibûn Tirkiyê, ji bo ku li ser Tirkiyê raporekê hazir bikin. Ev rapora ku Helsînkî Watch belav kir, rapora vê heyetê ye. Herçiqas Tirkiye pirr guh nade daxwazên organîzasyonên wiha jî, lê Helsînkî Watch cardin jî ji hukûmeta Tirkiyê van daxwazên jêrin dike.

Divê Qerarnama 413'a ji îcraatê rabe û ew mafên ku bi vê qerarnamê ji holê rabûne divê giş bi paşde bên dayin.

Sîstema milîstiya gundan divê bête rakirin.

Li herêmên ku şer lê heye divê xelkê sivil bête parastin.

Li herêmên ku tevlihevî lê heye, beryî armanaca parastina canê milet, ji bo tu armanek din divê xelkê sivil bi tu hawayî neqlî dereke din nebe. Di rewşa parastina canê ahlî de jî divê ji Peymana Cenewrê ya 1949'an, ji protokola wê ya numara 2'an re îtîat bête kirin.

Hukmên huqûqî yê navnetewî ne tede, divê zû bi zû mayîn neyê bi kar anîn.

Tahqîqata destpêkê jî tede, divê serbest be ku awûqat karibin kesên girtî û hefsî bibînin, bi wan re bi Kurdî bipeyivin bi tenê bîmînin. Bi destxistina hemû wesîqeyên ku ji bo parastinê hewcene, divê munmkûn be.

Dûmahîk: r.11

Li Diyarbekrê Operasyon

Piştî derketina qerarnama 413'a û 424'a ku ev qerarnama di raya giştî de wek qerarnama sansur û surgunê tê zanîn, hemû kovarên pêşverû û soyalîst hatin sekinandin û heta sansurek giran danîn ser rojnamevanên rojane yê Tirkiyê jî. Kovara "Deng", "2000'ê Dogru" û "Halk Gerçegi" bi temamî hatin sekinandin.

Di 24'ê Heziranê de li Diyarbekir û Farqînê operasyonek mezin li dijî xwendevan, berpirsiyar û kesên ku kovara Medya Guneşi belavdikirin çêbû. Li gora agahdariya Amnesty International di van operasyonan de nêzî 30 kesî hatin girtin û îşkence bi wan hatiye kirin. Di nava wan kesan de berpirsiyarê Medya Guneşi yê Diyarbekrê Muzaffer Tekeş û Guzel Ak (yek ji xebatkarê kovarê) jî hene. Kesên din jî ev in:

Dûmahîk r. 11

Li gora rojname "Argumentî i Faktî" çima Yekîtiya Sovyet alîkariya Iraqê kiriye?

Li ser Iraqê: rastî ev e

rûpel
4

Joe O'Sullivan:

"Kurd Îrlandiyên
Rojhilata Navîn in"

rûpel 6-7

Rojeva Mehê

Siyaseta kevn bi fêlbaziyên nuh

Kes û dezgehên siyasî, dîplomasiyê û yê mafên mirovî yê ku bi Tirkiyê ve mijûl dibin, gava bala xwe didin çapemeniya Tirkan, beyanên serokên partiyên burjuwazî û endamên hukûmetê ku li ser Kurd û Kurdîtiyê ne, ji wantirê ku guherandinek esasî di siyaseta resmî ya Tirkiyê a li ser pîrsa Kurdî de çêbûye. Ew gelek caran xwe dispêrin beyanên serokwezîr, endamên hukûmetê û serokên partiyên û îddîa dikin ku di siyaseta Tirkiyê ya beramberî pîrsa Kurdî de guhertinek ber bi başiyê çêdibe. Çimkî, roj tune ye ku navê Kurdistan di beyanên berpirsiyarên resmî û ne resmî yê dewletê de derbas nebe. Serokwezîr, peywendiyên xwe yê bi Kurdîtiyê ve eşkere dike, hin endamên hukûmetê, berpirsiyarên partiyên û dewletê, parlamenter û h.w.d. Kurdîtiya xwe dîrekt yan îndîrekt eşkere dikin. Tê gotin ku di welêt de zimanê zikmakî yê kê çiyê heqê wî ye ku bi zimanê xwe bi axive û h.w.d.în û h.w.d.în. Heta wilo lê tê ku ne bes biyanî gelek Kurd û Tirk bi xwe jî dikevin wê hevîyê ku li ser pîrsa Kurdî guhertinê girîng di siyaseta Tirkiyê de çêdibin.

Lê her di vê wextê de hin buyerên esasî jî hene, didin xwiya kirin ku ev peyv û beyanên li ser Kurdistan ne nîşana guherandina siyaseta Tirkiyê ne lê taktîkên fêlbazî yê nuh in ji bo meşandina siyaseta kevn. Herî baş mesele di Civîna Ewlekarî û Hevkarî ya Ewropa de eşkere bû.

Di vê civînê de ku çendekî berê li Kopenhagê pêk hat, Tirkiyê bi resmî da xwiyakirin ku Kurdistan ne wek miletekî lê wek eqaliyetekê jî qebûl nake.

Wek tê zanîn girîngiya civînê li ser mesela eqaliyetan bû û hin dewletan pêşniyarî anîbûn ku, tarifek standart ya navnetewî ji bo eqaliyetan û mafên wan bê qebûlkirin. Ji her dewletê bêtir Tirkiye li hember rawestiya û da xwiyakirin ku eqaliyet ji bo wê ew in yê ku di peymanî Lozanê de hatine qebûlkirin, jê pêştir eqaliyet nînin. Peymana Lozanê jî grûbên civakî yê ne musulman ên wek Ermenîyan, Rûman, Suryaniyan û Yahudiyan eqaliyet qebûl dike. Kurd wek grûbek civakî ne wek milet, ne jî wek eqaliyet dikevin ber vê peymanê.

Beyana berpirsiyarê dewleta Tirk ku di Civîna Ewlekarî û Hevkarî ya Ewropa de hat dayîn eşkere dide xwiyakirin ku dewletê siyaseta xwe li hember pîrsa Kurdî ber bi başî û nermbûnê ve neguhertiye, siyaseta her ya berê ye.

Lê gelo, çiyê wan beyanên li ser Kurdistan di vê siyaseta de çiyê? Ew jî di avakirina siyaseta Tirkiyê de tê xwiyakirin ku bi argumentên nuh tîr rûpûşkirin. Tirkan berê digotin, li Tirkiyê herkes Tirk e, eslê miletê Tirk ji Asya-Navîn hatiye. Kurd jî ne Kurd in, Tirkên çiyayî ne, ew jî bi nîjadê xwe eşkere Tirk in ku ji Asya-Navîn hatine. Loma li Tirkiyê miletek heye, ew jî miletê Tirk e û bi esilî ji Asya-Navîn e. Heta îro siyaseta argumentên wê ev bûn. Lê îro ev argument li hember rastiya jiyandê pûç bûne. Ne li Tirkiyê û ne jî li dinyayê kes bawer dike ku Kurd Tirkên çiyayî ne û ji Asya Navîn hatine. Pûçbûna argumentan di civînên navnetewî de û li hember peymanên navnetewî, cîh li Tirkiyê teng dike, bîhmê lê diçikîne. Tirkiye dixwaze carek din cihê manewra xwe fireh bike, bîhna xwe vede, loma dev ji wê yekê berdide ku Kurd Tirkên çiyayî ne û ji Asya-Navîn hatine. Ji dêvla wê, dest bi fêlbaziyek nuh dike, dibêje rast e li Tirkiyê bi nîjadê xwe, hin hene Tirk in ji Asya Navîn hatine, hin jî hene Kurd in ji berê de li cihê xwe bûne, Ereber hene Çerkez û Laz hene, lê ev hemû bi hev re, di nav hev de mehiyane û navê wan bûye miletê Tirk. Li Tirkiyê bes miletek heye ew jî miletê Tirk e, ku ne navê nîjadekî ye, navê miletekî ye ku gelek nîjad bi hev re tê de hatine heştirandin. Loma jî zimanekî resmî yê vî miletî heye, ew jî Tirkî ye. Wek çêbûna miletê Amerîka. Çawa li wir zimanê resmî Îngilîzî ye, li Tirkiyê jî zimanê resmî Tirkî ye, lê li mala xwe kî bi çî zimanî diaxive bira bi axive.


Bi kurtî siyaseta a kevn e lê bi fêlbaziyên nuh tê rûpûşkirin.

■ A. Îsmail

Ji bo raxirandin û xapandina vî gelf bo birina Îraqê, dek û dolabên dezgehên her du dewletan berdewam in. Bona bicihanîna vê projeyê, ji şerê psikolojî û aborî bigre, heta bi jehir kirina nê û çêkirina hêlmên casûstiya di nav kampên de û bi derew û bertîlan daxwaza vegerandina multeciyan û riyên din tîr bi kar anîn. Heyetên Îraqê berdewam tîr Diyarbekir, Mêrdîn û Mûşê. Tirkiye jî qedrê wan digre. Di 9'ê Nîsana 1990'î de heyetek bi serokatiya çêşîkê bi navê deng MIHEMED HEMZE ji Îraqê hat Tirkiyê û 5 rojan ma. Di vegeza xwe de bo radyoya "Dengê Enqerê" da xuyakirin ku seredana wî bi encamên pir baş bi dawî hat. Mihemed Hemze di şerên 1985-'86'an de yek ji serokên hêzên çêşîkan bû û li Mangêşkê Cafer Bêşîkî bi destê wî hat îdamkirin. Piştî vegeza Hemze Mihemed ji Tirkiyê, di 30.04.1990'î de 'U.N.H.C.R. karî bicîhkirina multeciyan li Mêrdînê rawestand û projeya xanî û avahîyan hat redkirin.

Di 05.05.1990'î de heyeteke resmî bi serokatiya serokwezîrê Tirkiyê Yildirim Akbulut - ku heyet jî 120 kesan pêk hatibû - çû Îraqê. Piştî çûn û hatina wan rewşa me yek-car xirab bû; di 12.05.1990'î de du çêşîk: XALID HEMZANÎ û HECER BAMERNÎ hatin ba waliyê Mêrdînê. Walî gazî 10 multeciyan kir ku biçine dîtina wan. Lê ji wan 10 kesan yekî daxwaza çûna ba wan qebûl nekir. Bi şev ZÊREVAN KOVILÎ bi dizî kincên efendiyan li xwe kir û çû ba çêşîkan. Multecî bi çûna wî hesiyên û mala wî ji kampê der-xistin. Waliyê Mêrdînê ser vê yekê hat kampê, nav çadîran; wî bi xwe bi daran li multeciyan xist. Multeciyan jî kevir avêtin wî û yê bi wî re. Îcar walî bi debanca xwe û polîsan jî bi G3'an çadîran ber gullan, çadîrên me kunkun kirin, lê zerara giyanî negihiştî kesî. Piştî niv se'etê walî Ahmet Nevroz bi polîsan ve ket nav çadîran, çû ber çadîra Zubêr Mayî, - Zubêr ne li malê bû - debance xist nav çavên jina wî û zarokên wî û lê xwarin. Ji bo 6 rojan derketin û ketina nav kampê hat qedexekirin, her weha derketina endamên Komîta Multeciyan ;

- Bêhêvîbûnê piştî me şikandiye
- Debera sed hezar mişkî li ser me ye
- Cîhan tev bê deng e, em li derveyî dîrokê dijîn



Zubêr Mayî, Cemîl Bêşîkî, Ebdulla Hirûrî, Husên Bêşîkî, Rizgar Salih Kemekî, Mikail Îzamnî, Rêving Hirûrî - ji binî hat qede-xekirin û nahêlin ew bi telefonê jî bipeyivin. Walî eşkere dibêje ku endamên komîtê nahêlin xelkê biçe Îraqê. Kesên ku piçek dewleta Tirk nas bikin, dizanin ka rewşa me çawa ye, lê mixabin ta îro jî ne Bereyê Kurdistana Îraqê û ne jî rêxistinên mirov-perwer dengê xwe bi awayê ku pêwîst bilînd nekirine, cîhan tev bê deng e. Heçkû em li derveyî dî-rokê dijîn.

Rewşa Aborî:

Ji kampê derketin hatiye sînor kirin. Ji 12.000 kesan rojê 150 kes dikarin derkevin derve û danê êvarî zû vegezin kampê. Anku kesî ew îmkân nîne ku bikare bi dizî, yan eşkere ji xwe re karekî bike û bi hinek pere, yan kinc, yan xwarin vegere nav kampê. Kesên ku berê pere bi xwe re anîbûn, yan zêrên jina xwe firotin, niha bê pere û zêr in û tiştekî kesê nemaye. Jixwe ewên ku li Kurdistana Îraqê mal û

pere hebûn tev vegeziyane. Û yê mane jî bawer bikin gelek cara jî şerma jin û zarokên xwe naxwazin biçin "mala" xwe. Multecî mecbûr bûn ku bi şev xwe li tîlê xî û bi meşê biçin bajêr, belkî karekî bibînin. Şeva 22 li ser 23. 05. 1990'î de du xortan xwestin ji tîla li dor kampê derbas bibin û biçin bajêr, lê cendîrme pê hesiyên û artin; weha li wan xistin ku 5 rojan li nexweşxanê man. Ez nîzanim pêwîst e bibêjim ku hukûmeta Tirkiyê tiştekî xwarinê nade me, tiştê ku ew didin bi tenê tîra du rojan dike, lê rojên din em tev birçî li benda alîkariyekê dimînin. Heta îro jî ne ji Bereyê Kurdistana Îraqê ne ji aliyekî din ê siyasî alîkarî negihiştîye destê me, lê xelkê van bajarên û Kurden li derve tiştê ji destê wan tê, teksîr nakin. Rewşa aborî ya Kampa Mûşê jî hemûyan xirabtir e, çimkî ew dikarin rojê bi tenê 50 kes biçin derve û piraniya wan jî pîr in, kar ji destê wan nayê. Li kampa Diyarbekir rewşa baştir e, çimkî ew pitir derdi-kevin derve, car car kar dikin û xelkê bajarê Di-yarbekir jî pîr alîkariya wan dike.

Rewşa Siyasî:

Tev endam û tagirên partî û rêxistinên Kurden Îraqê bêhêvî bûne, çimkî çî rêxistin li me xwedî derneket. Her weha nexweşiyên di navbere me de jî sedemekî bêhêvîtiyê ye. Tevgere Rizgarîxwaz a Kurdî li Îraqê bi çî awayan nikare ji kêmasiyên xwe xilas bibe, çimkî xwe û gelê xwe ji bo vê yekê amade nekirîye. Qene'eta me weha ye ku bi hevîya tevgera nuha çî bi dest me nakeve. Anarşiyek giştî di bîr û baweriyên de peyda bûye, kes nîzane çî bike û kes nîzane wê sibe çî bibe, paşeroja me tarî ye. Bêhêvîbûnê bi carekê piştî me şikandiye û ji bo teslîmbûnê rê xweş dike. Bi ya min eger sibe rewşa me ya aborî xweştir jî bibe, lê ku guhertin di tevgera Kurdî ya Îraqê de peyda nebin, multecî wê her berê xwe bidin Îraqê.

Heta nuha bi rîya hukûmeta Tirk hejmarî multeciyan ku çûne Îraqê, welatên din:

Bo Îraqê:
2100 kes ji kampa Mêrdînê çûne Îraqê
1635 kes ji kampa Mêrdînê

Redaksiyon: M. Elî, Zinarê Xamo, Hesen Mizgîn, Lewend Firat, Mîrza Bextiyar. Redaktorê berpirsiyar: M. Elî Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Malmîsanîj

Adres : Armanç
P. Box: 6004
172 06 Sundbyberg
Sweden

Telex:
ATTN ARMANC 11083 TELE KC
Telefax:
ATTN ARMANC 46-8-801825

Ansvarigutgivare:
Kurdîska Demokratîska
Arbetar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

Kampan

çûne Îraqê
5500 kes ji kampa Mûşê
çûne Îraqê
1700 kes ji kampa Diyarbekirê çûne Îraqê.

Welatê din:

340 kes ji kampa Mêrdînê çûne Frensa
60 kes ji kampa Mêrdînê çûne Sûriyê
35 kes ji kampa Mêrdînê çûne Danîmark
17 ji kampa Mêrdînê çûne Swêd
16 kes ji kampa Diyarbekirê çûne Swêd

Hejmara multeciyên li kampan:

Kampa Mêrdînê: 11.505 kes
Kampa Diyarbekirê: 11.550 kes
Kampa Mûşê: 3000 kes

Rewşa Sihî:

Bi destpêka havînê, komeke nexweşiyên êrişan ser kampan. Ji % 75 multecî bi nexweşiya Dîzanterî ketin. Her weha êşa gewriyê û boriya bakişandinê, kêmbûna xwînê, hatina xwarê ya zixta xwînê, êşa boriya mîzê û nexweşiyê din her roj peyda dibin. **Li gor doktorên Kurd ên multecî û doktorên Ewropî sedemên van nexweşiyên pir in:**

1- Ava vexwarinê ne paqij e, ava pişitiyê tevî ava vexwarinê dibe. Boriyê ava vexwarinê sererd in û ji plastîkê çêkirine. Boriyên ava vexwarinê û yên pişitiyê tevlihev in û gelek cara tirimbêlên ku ji bo valakirina "tuwaletan" tên, boriyên ava tuwaletan dişikên, her du av tevlihev dibin û heta ku ev yek tê dîtîn, 10 roj derbas dibin.

2- Çi hemam, an serşok li kampê nînin û ji bo serşuştinê û firaxuştinê cihên cida hatine çêkirin û cihên wan sererd in û bîneke piş jê tê.

3- Gilêş û zibilê ji ber xwarinê dimîne, li nav kampê dimîne, nayê avêtin. Li kampê li vir û li wir gûfank pir in, mîş û mişk wek axê ne.

4- Mişk ewqas pir in ku xwarina me ji me zêdetir dixwin. Em li Kampa Mêrdînê 11.500 kes in, lê bawer dikim ku debara pişir ji "100.000 mişkan li ser me ye.

5- Xwarina me pir kême û kalorî, yan protein, yan vîtamînên ji bo mirovekî pêwîst nîstînin. Lewra ji em nikarin li hember nexweşiyên li ber xwe bidin.

6- "Nexweşxana" li kampê wek polîsxanekê ye. Doktorê û hemşîreyek lê heye û gava em diçin ba wan wek polîsa li me duheyînin, ji bo hemû nexweşiyên aspirînan didin me. Doktorê "nexweşxanê" Doktor Cengiz ji me nefret dike û wer kiriyê ku em ji lêdanê ditirsin. Dema ku em nexweş dikevin, gelek nexweşên me yên giran dimirin, çunkî dereng lê dipirsin, aspirîna tesîrê li nexweşiyê nake û heta dihinêrin nexweşxana bajêr, êdî pir dereng e.

Rewşa Civakî:

Kamp li ser tîkiliyên Kurdistanê gund bi gund dabeş bûne. Ji du eşîrên serekî - Berwarî, Dostkî - xelkê 73 gundan li kampê dimînin. Hevrikiya eşîran hebû, lê niha kême bûye, ji ber ku xelk ji hemû tiştên westiyayê. Helbet eger desthilatek tev xelkê cih di bin baskên xwe de, li dor armancên muşterek necivîne, wê xelk bi xwe ji xwe re li alternatîvan bigere. Li kampê, gundîti, yan babik, yan ocax bûne merkeza desthilatê, gelek cara di navbera gundan de şer peyda dibin, tolen kevin tên bira xelkî. Di şerê gundan de, di 09.02. 1990'î de hat kuştin. Piştî 5 mehên aştan wan hat kirin. Komîta Kampê di lihevhatin û aşkirinê de roleke mezin dilîze, lê gelek caran tiştên weha ji dest mirovan derdikevin.

Heta îro pitir ji 500 dawetan li kampê li dar ketine ku ji% 95'ên wan pêgûhûrk in. (Berdêl) Dûdik - aletê mûsiqê - li kampê hene û xelk li ber govendê digerin. Xelk diçin pîrozbahîya zavayan. Tîkiliyên civakî her wek yên Kurdan e.

Rewşa Xwendinê:

Li kampa Mêrdînê xwendîngên zarokan hene; me bi xwe bi îmkaniyê xwe vekirine û zimanê Kurdî didin. -Tevî tev pêşilêgirtina hukûmete Tirk- 17 xwendîngên me hene, ji 6 ta 12 salî 2500 zarok lê dixwînin. 60 mamostayên me hene ku hemû ji multecî ne. Herfên Erebê tên bi kar anîn, lê ji bo tevzarokan derseke herfên latîniya bi Kurdî jî heye. Em ji bo xwendîngan muhtacî qelem, defter û pirtûkên fêrbûna Kurdî ne û di vî warê de li benda alîkariya Kurdên li Ewropayê ne. Her weha pitir ji 700 zarokan diçin kursa xwendina Qur'anê.

Kampa Mêrdîn
31.05.1990

Dîroka edebiyata me ya devkî ji aliyê "devavêtin" ê ve gelekî dewlemend e. "Devavêtin", "qerfêkirin", "henekpêkirin", "strî tîrakirin", "şûjin tîrakirin" û he ta bi çêr û xeberpêkirin jî bûye meydana "kerxesêna" ku êdî kî çî dixwaze dike, kî çî dinivîse dide çapkirin û kî çî partiyê datîne û edebiyata me, tîpên ku Kurd pê dinivîsin, zimanê ku em pê diaxivin her tiştên me di destpêka tevliheviyekê de dike "çelqelq", geh bi vir de û geh bi wir de diçe.

Tiştê heye ku divê êdî em Kurd jî wek gelên din gerek xwe bidin serhev, hişyar bibin, li hev guhdarî bikin û ji hev bixwin; da ku ne wek "nanê garî" hev negirin lê hev bigrin da bibin tiştê, lê nexwe wê dijminê me perçeyên me yên piçûk wek guhên me yên ku gelekî "nabihîzin" hûr û piçûktir bikin.

Divê em her kesê ku; fêrî xwendin û nivîsandinê bû "nivîskar" hesab nekin, her çar kesên komek ji xwe re ava kirin "partî" hesab nekin, her kesê ku ji xwe re "çar şagirt" peyda kirin mamoste hesab nekin, her koma ku ji xwe re "çend rûpelan çap bike" rojnamevan nas nekin û gelek karûbarên wek yên jor ku ne "karê kirinê" ne gerek nekin.

Tiştêkî din heye ku divê em rê jî li hev negirin û hevûdu bi "devavêtinê", "henekpêkirinê" û strî tîrakirinê neşînin, hevûdu "qels" û "pis nekin". Divê

"rexnelêgirtin" di cihê xwe de, di dema xwe de, bi awayê objektîv û nemaze divê "rexne" bo şiyarkirin û rakirinê bê bikaranîn. Heger em "rexneyên" negatîv ji xwe re bikin adet wê wek min li jor jî got; "rexnegirtin" bibe "henekpêkirin" û bi baweriya min wê hingê alîkariya me neke, wê me ji nezani û perçebûnê azad

xwezî "dîroka" yan jî "çîroka" nivîsandina pirtûka "Em Bixwînin" baştir zanîba! Gelek tiştên din yên ku, Lawikê Berrîvanî bi a min ku pê nizane jî hene ku wê tîra wî ya careke din jî bike ku rexne li vî pirtûkê û nivîskarên wê bigre. Lê dîsa jî her bijî Lawikê Berrîvanî bo vî bal kişandinê û hevî dikim ku

paşî wê jî ji destê me sê kesên pêşî yên amadekar derket û min bi xwe êdî hew çav pê ket ku şaşî û çewtiyên wê bibînim. Piştî çend salan li bendî kontrola "zimanzanên Kurd" ma û di dawiyê de gelekî hat guherîtin û ji qalibê xwe yê pêşî derket. Paşî demê dirêj min bi nameyekê xwe ji wî karî da paşî û bi tenê navê min li wir ma. Lê dixwazim bêjim ku "rexne" yan jî "resensûn" di vî warê de wek Lawikê Berrîvanî li ser pirtûkan rast jî be weha nayê kirin. Divê di destpêkê de bê û divê ji her kesê amadekar bête pirsin û hingê bi awayê objektîv rexne tê kirinê.

Gelek aliyên vî pirtûkê ên pozîtîv jî hene û gelekî alîkariya wê jî çêbûye. Divê mirov başî hev û tenê bi aliyekî negre. Hingê wê "rexne" nebe "henekpêkirin" û cewaziya "rexnelêgirtin" û "resensûnê" wê were xuya kirin.

Xebata "nivîskarî" û "rojnamevaniyê" bi giştî xebateke "mîrovani" ye û divê rûyê xwe yê geş û xweş nîşanî xwendevanê xwe bike da ku jê fêde hebe.

Di sa dixwazim bêjim ku mebesta min li vir ne bersîva "Lawikê Berrîvanî" dayine, lê bi giştî divê em bala xwe bidin rexneyên pozîtîv ji bo; pêşveçûn û yekbûn ji her gelî bêtir ji me Kurdan re pêwîst e, divê em ji karê kolektîv nerevin û kêmasiyên xwe, şaşî û çewtiyên xwe qebûl bikin, ji bo baştir û zanatir bibin.

"Rexnegirtin" yan "Devavêtin"

Bareş Bettê

neke, wê perçên me yên heyî hîn ji bêtir bike.

Gelek rexnegirên me mixabin bi vî şopa negatîv de dimeşin û di rojnamên xwe de gelek caran "kêçekê" dikin "deve" û dikarin ji bo "kêçekê" lihêfekê bişewitînin.

Hinek ji wan jî wek; Lawikê Berrîvanî ku di Armançê de dinivîse; bi top û tang, bi delîl û îspat û gelekî bi zanîstî rexneyê xwe digre û êdî nahêle ku av ji ber werê, rexnegiriya xwe dike.

Rexneya wî ya li ser pirtûka "Em Bixwînin", hevoka "Evîn hêdî here! lampa sor pêket" rast e û di cî de rexne girtiye. Lê xwezî di dema wê de bigirta. Û

gelek Kurd wê zarokên xwe ji lampa sor dîr bixin, wan ji mirinê xelas bikin. Lê wa xuyaye ku ji Lawikê Berrîvanî û nivîskarên vî pirtûkê pêve kesekî ew nexwendiyê, nexwe wê heta niha gelek zarok di trafikê de bihatina kuştinê. Wê çaxê wê rewşa me "nivîskarên" Kurd gelekî xerab bibûya wê nivîskarên vî pirtûkê bi teqandina "topa" Lawikê Berrîvanî re bibina toz û dûman.

Di dawî de dixwazim "BÊ HENEK" bêjim ku rexne Lawikê Berrîvanî rast in lê çîroka nivîsandina vî pirtûkê ne wek ku di pirtûkê de hatiye gotin e. Bi rastî ew xebat di du (2) hefteyan de hat amadekirin û


Li Stenbolê Seyranek

Ev serê çar salan e ku li Stenbolê ji alî Kurdan û hêzên şoreşgeran ve salê carekê bi navê seyranê, hin fealiyetên kêf û şahiyê tên amadekirin. Xort û keç û malbatên Kurdên li Stenbolê beşdarî vî seyranê dibin.

Seyrana îsal jî di 10'ê Hezîranê de ji alî YDKD (Komela Kulturî û Demokratîk a Welatparêz) û HKD (Komela Kulturî ya Gel) ve hat amadekirin. Nêzî 2500 kes beşdarî vî seyranê bûn.

Programa seyranê gelek dewlemend bû. Programê bi axaftineke derheqê amadekirina seyranê dest pê kir. Axaftin bi Kurdî û Tirkî bû. Hevalê ku li ser navê YDKD yê bi Kurdî axifî bi kurtî behsa rewşa Kurdistanê û bûyarê dawî kir û bala hemû kesên beşdar kişand ser girîngiya hevkarî û yekîtiyê.

Piştî muzîk û folklor



Bîstek ji seyranê Foto: Armanç

Kurdî, çend kesan hin helbest ji Cîgerxwîn û Rojen Barnas xwendin.

Bêguman, beşê herî balkêş ê programê piyеса Hecî Emer bû, ku ji alî Koma Tîrêj (Koma Tiya-troya YDKD'ê) ve hat

pêşkêş kirin. Piyеса Hecî Emer li ser întifada dawîn a li Kurdistanê û li ser rewş û jiyana Kurdên li dervayî Kurdistanê bû.

Hemû kesên ku beşdarî vî seyranê bûn gelek kêfxweş û dilx-

weş bûn. Dawxaziya wan ew bû ku seyranên weha hersal çêbibe.

Mamed Merwanî
Stenbol

Li ser Iraqê: Rastî ev e

Stiriyên

Lawikê Berrivani

“Ger hebûya me îttîhadek”

Tarîxa belavbûna şûra netewatîyê pîrr ne kevn e, pîrr pîrr dîgîje 200-250 sal berê. Ew mîletên di vî riyê de zû şiyar bûn û xwe kirin yek, dewletên xwe ava kirin û yên dereng man jî, man bin dest.

Gelo sebebê bindestmayîna Kurdan di nav wan de dereng destpêkirina şûra milî ye? Şerefxanê Bedlîsî di Şerefnamê de vî yekê bi nîfrek Pêxember ve girê dide. Çîrok bi kurtayî wiha ye:

- Dibêjin dema Hz. Mihemed Pêxembertîya xwe filan kiribû û nav û dengê wî li çarhawêlî dinyayê belav bûbû, mezin û sultanên dewletan ji bo ku resûltîya wî qebûl bikin wefd dişandin ba wî. Wê demê Sûltanê Turkîstanê jî Oxûz Xan bû, wî jî wefdê şand ba Mihemed. Serokê wefdê mezînekî Kurd bû, navê wî Buxduz bû. Buxduz merivêkî bi qîlafet û nelihevhatî bû. Mihemed gava vî elçiyê wek hûtekî û nelihevhatî di huzûra xwede dibîne, jê hez nake; Mihemed jî Buxduz dipirse, dibêje, "Tu ji kîjan mîletî yî?" Buxduz jî dibêje, "Ez Kurd im." Wê çaxê Hz. Mihemed nîfrekê dike, dibêje: "Ya Xudayê erd û esman, tu vî mîletî tu carî muwafeq nekî û nehêlî ku bi yek bin. Heger ku bibin yek, wê cîhanê jî bin de xera bikin.

Bi xwe qet nakeve serê min ku Xwedê "nîfira" Mihemed qebûl kiribe û loma Kurd nebûbin dewlet. Ger mesele "Buxduz" be, ez bawer im wê Buxduzê Tirk, Ereb û Eceman ji yê Kurdan gelekî bêtir bin. Lê di vî efsanê de jî sebebê ne dewletbûna Kurdan ne bi tunebûna şûra netewî, bi neykebûna wan ve tê girêdan.

Şaîr û mîletperwerê mezin Ahmedê Xanî jî di sed-sala 17'an de di Mem û Zînê de vî yekê bi tunebûna yekîtiya Kurdan ve girê dide û weha dibêje:

Ev xîret û ev hawê hîmmet
Bû mani'ê hemaê berê mînnet
Lew pêkve hemîşe bê tîfaq in
Dayim bi temerud û şîqaq in
Ger hebûya me îttîhadek
Vêkra bikra me îngîfayek,
Rom û Ereb û Ecem tamamî,
Hemîyan ji me re dikir xulamî,
Tekmîl dikir me dîn û dewlet,
Tehsîl dikir me ilm û hîkmet,
Temyîz dibûn ji hev miqalek,
Mumtaz dibûn xudan kemalet.

Gelo Kurdan wek mîletên din ji bo azadiya xwe baş şer nekirin loma man bindest? Tarîx şahide ku li dinyayê kê mîletî di vî riyê de bi qasî Kurdan xwîna xwe herikandiye.

Wê gavê çima ev bindestî? Wek ku xuya ye, li gel ku şûra netewatîyê di sed-sala 17'an de di nav Kurdan de tê dîtin lê cardin nebûn xwedî dewlet. Li alî din, Tirk di destpêka sed-sala 20'an de bi Tirkîtiya xwe hesiyan, lê ne tenê bûn delwet, Kurd jî ji xwe re kirin kole.

Muheqqeq di derekê de çewtîyek heye.. Îcar ev çewtî di Kurdan de ye ya jî di "derek din" de ye hêjaye ku meriv serê xwe pêre biêşîne.

Bi dîtina min ji bo ku meriv karibe bibe mîlet û dewlet, li gel pêwîstîya hebûna şûra milî û gelek tiştên din, hev-du qebûlîkirin, tehamûl û toleransa li hember hev jî bi qasî şûra milî muhîm e. Yanî divê em tim nebîjin "ez", carna jî fêr bibin bibêjin "em."

Bê guman hemû kesên pêşverû, şoreşger, hêz û partiyên Kurd giş jî dixwazin Kurdistan rizgar bibe, di vî warî de şika kesî tune ye. Lê gelş ewe ku ji bo vî armancê em dest nadin hev, her kes dibêje "Rustemê Zal" ez im û "ezê" Kurdistanî rizgar bikim. Gotina "em", ji Kurdan re hîn mefhumek xerîb e.

Lema jî A. Xanî gotiye:
"Ger hebûya me îttîfaqek
Vêkra bikira me îngîfayek."

Lê îttîfaq jî her roj nayê ber nigê meriv, ji bo wê jî şert û firsend divê çê bibe. Tercubeyên tarîxa me ya nêzik û guherandinên firo li dinyayê çê dibin ji bo bi cî anîna daxwaza Ahmedê Xanî fersendek baş e. Lê wek nivîskarekî Awustûrî dibêje, "Fersend, jî wek jineke nazdara bi cîlwe ye. Ku carê derî girtî bibîne, êdî hew bi paş de tê."

Heya nuha kê mîlûmat li ser bûyerên ku li Iraqê di-qewimin, derbasî masmedîya Sovyetê bûye. Ev welat, tenê bi çend sed kîlo-metran dûrî sînorê me yê başûr e.

Gelo sîstema siyasî ya vî dewleta Erebî ku bi rû-nîştvanên xwe 16 milyon in, çiyê? Berevajîya hemû prognasan, rejîma ku serok Seddam Huseyin serokîtiya wê dike, di şerê bi Îranê re ziyar û xerabiyên mezin gihanê welêt, ne tenê ne hêrîff her wisa li ser pêlên şûrê qewmîyatîyê bi hêzûr bû. Aboriya Iraqê tadeyek mezin gihîştê, lê hebûna îhtiyata pîrr ji neftê û venekirina ji sermîyandariya ecnebî re, hêviyê çê dike ku ew xwe ji nuh ve ave bike. Û li gora pressa ji derve, S. Husên niha xwe xurt dibîne û ji her demê bêtir ji xwe bawer e.

Garantîya rejîmê ya bîngêhî; milyonek leşker e, nêzî 5 hezar tank in, 500 balefîrên herbê ne û bîyî van rakêt û çekên kîmyayî jî hene. Hebûna ordiyek wiha mezin, di hêla ku ew karibe bi çalakîyên êrîşî rabe. Lê ya rastî, ne belû ye ku ewê berê wan bide ku. Iraq xwe di eniya Îsraîl de wek hêza refa pêşî dibîne. Lê heya niha Iraqîyan hejmarek mezin ji çekan (ji wan tank jî hene) gihandine hêzên General Awûnê ku di şerê Libnanê yê xwe bi xwe de li hemberî Sûriyê rawestiyayî ye.

Garantîya duyemîn ji bo rejîmê, partiya BAAS e. Navê wê bi yê temamî; Partiya Vejîn a Erebî ya Sosyalîzmê ye. Gurûbên wê yên çekdarî hene. Piraniya wan endamê partiyê ne. Di nêrîna serokîtiya welêt a siyasî de, van teşkîlatên wiha divê ji azadiya nîzami re bibin belans.

Garantîya sêyem ji bo rejîmê, cîhazê îstîxbaretê ye, ku rehên xwe berdaye tamarên civakê. Weku rojnamevanê Îngilîzî V. Mîllet dinivîse; "Iraqî heya di nav malên xwe de jî nikarin nêrîna xwe bi rengekî vekirî bibêjin, çimkî cîhaza emnî û îstîxbaratê, sîstema guhdarî û qelawîziyê hewqas xurt e ku her kes jê bi saw e. Bidardekirin jî (Bi riya nîşandina di TV de) bûye fenomenek rojane...

Himên rejîmê li ser xwîne ye

Cara pêşî, piştî inqîlaba sala 1963'an BAAS'îyan çend mehan hukim xistin destên xwe. Di vî qonaxa kin a hukmê xwe de bi kuştina komunîstan " a bi hovîti wan deng da". Û bi riya leşkeran ji ser hukim ketin. Wê gavê hukûmeta Sovyetî û Partiya Komunîst bi rengekî vekirî emelên Baasiyan protesto kirin.

Cara duyem, sala 1968'an Baasî hatin ser hukim û qunaxê da xuya kirin ku wan ji şaşiyên bûyerên berê fîbret girtine. Reformên civakî-aborî çêbûn û armanca serokê Baas di "bicîkirina programa guhertinên îstîfîrakî di hemû warên civaka Iraqê de" didît.

Zêdeyî 10 salan General El-Bekîr (Sala 1963 serokwezîrê hukûmeta Baasî yê pêşî bû) serokîtiya dewletê kir. Lê herkesî pê dizanîbû ku serokê fîlî, merivê wî yê ciwan û bi taqet Seddam Husên e. Sala 1979'an wî generalê kal şande teqadûdê û bû xwediyê welêt ê bi tenê.

Seddam Husênê ku bi pisporîya xwe awûkat e, cara pêşî di sala 1959'an de pêla ku muhawela kuştina dîktatorê Iraqê yê berê Qasim kir, navê wî derket.

Serokê Iraqê bi eslê xwe Tekrîtî ye. Û berpirsiyarên dewlet û partiyê hemû ji bajarê Tekrîtê ne. Li gor rojnamevanekî Amerîkî nivîstîbû; "Serokên Iraqî demeke dirêj kêr li piştê hev dan, heya ku nema bawerîya wan bi kesî bê. Ji ber vî yekê wan dît ku pêwîst e divê ew hemû ji deverekê bin; ji bo ku pişt rast bin."

Xefîk

Lê ev tişt hemû di sala 1979'an de qewimîn, yanî piştî 11 salan ji hatina Baas a ser hukimê cara duyem. Bi xwe destpêka rejîma Bekîr-Husên wilo dikir ku intîbaekî xweş, çî li hundir û çî li der, li ser xwe bihêle. Rejîmê dixwest, bi taybetî di çavên Yekîtiya Sovyetê de xwe qenc bike. Çimkî ew jê re bûbû "qebûlnama stratejîk" û yek ji wan delîlên ku Baasiyan dabûn ser riya pêşverûtiyê; avakirina eniyek yekbûyî (sala 1973'an) bi komunîstan re bû. Hîngê jî rejîma Iraqî re, berî her tiştî divyabû dawiyê li serhildana Kurdan bîne û ji ber vî yekê pêwîst bû ku komunîstan bêteref bikin, ji bo ku paşê li wan bi xwe jî vegezin û wan di nav nîgan de bipelîxin.

Di dawîya salên 70'î de, bi hezaran Komunîst xayîn filan bûn û hatin kuştin. Ew li her deverê mîlahek bûn. Kesên ku şik diçû ser wan, ku ew komunîst in, li malên wan ya jî li ciyên kar li ber çavên xelkê di nav sîkakan de dukiştin.

Pirbûna hejmare kuştina komunîstên Iraqê, merov dikare bi kuştina komunîstên Şîlî û Endenozya muqayese bike.

Beşekî ji komunîstên Iraqê, vegeziyan Gireva bakurê çiyayên Kurdistanê. Ne hukûmeta Sovyetî û ne jî Komîta Merkezîya Partiya Komunîst rejîma Iraqê bi hawakî resmî protesto nekirin.

Ji bo çareserkirina pîrsa

netewî, hukûmeta merkeziya Iraqê û Kurdan bi salan şer kirin, ku Kurdan otonomî dixwestin. Êrîşên hukûmetê ji alî Sovyet ve nehat protestokirin. Dawiya dawî, sala 1974'an otonomî hate dayîn. Lê bi veqetandinê çend herêman ji axa Kurdistanê. Bi taybetî ew herêman ku bi neftê dewlemend bûn. Careke din Kurdan destdirêjiya ser mafên xwe qebûl nekirin û careke din agirê şerê pêşmergetiyê yê dudilî pêket.

Encama vî yekê ew bû ku Kurdên Iraqê yên bi hejmare xwe nêzî sê milyon û nîvî ne gihîştin qiraxa kadestrofa milî. Bi pelixandinê tevgera rizgarîxwaz a Kurdî û ji hevîstina hêzên serhildayî, hukûmetê jenosîdek heqîqî li hember sivilan bi kar anî. Hukûmetê ne tenê 30 hezar leşker bire ser wan (sala 1988'an) her wisa gaza jahre jî li dijî wan bi kar anî. Da ku xwe ji jehre xilas bikin bêtirî sed hezar Kurdî mişextî Tirkîyê bûn. Berî vî wextê ne kê mîlî vî hejmarê jî derbasî Îranê bûbûn. Sala 1987'an hukûmetê hezar gundên Kurdan rakir û "mintîqa emnî" ya 30 kîlo-metîrî danî. Ji ber vî çendê bi darê zorê rûniştvanên Kurd ên li ber tixuban ji ciyên xwe cêlî bûn. Li gora nûçeyan, di destpêka sala 1988'an de ji 4 hezar gundên Kurdan, tenê hezarek mabû û sê beşên Kurdistanê jî xelkên xwe yên ku bi sed salane lê dijiyan "rizgar bûbûn."

Çima em bê deng bûn

Ji ber ku manewra serokîtiya Iraqê, di siyaseta derve de ne kê mîlî ya hundir bi serketî bû. Sala 1972'an peymanê dostanî û hevkarîyê bi Yekîtiya Sovyet re hat îmzekirin. Destpêkê fena ku her tişt li gora m'anê xelîkên siyaseta me ya ji derve diçû. Iraqê şîrketên bîjî bo ku paşê li wan bi xwe jî vegezin û wan di nav nîgan de bipelîxin.

Di dawîya salên 70'î de, bi hezaran Komunîst xayîn filan bûn û hatin kuştin. Ew li her deverê mîlahek bûn. Kesên ku şik diçû ser wan, ku ew komunîst in, li malên wan ya jî li ciyên kar li ber çavên xelkê di nav sîkakan de dukiştin.

Pirbûna hejmare kuştina komunîstên Iraqê, merov dikare bi kuştina komunîstên Şîlî û Endenozya muqayese bike.

Beşekî ji komunîstên Iraqê, vegeziyan Gireva bakurê çiyayên Kurdistanê. Ne hukûmeta Sovyetî û ne jî Komîta Merkezîya Partiya Komunîst rejîma Iraqê bi hawakî resmî protesto nekirin.

Helbet, li vîra ne tenê menfeeta malî rola xwe lîst. Tiştê girîng xerîta Iraqê ya siyasî bû û jê bêtir tebîeta îdeolojiya wê ya siyasî bû. Ya rastî, rewşa

Iraqê heya piştî kuştina komunîstan, di nêrîna Sovyet a wê demê de, hewqasî ne girîng bû. Li nik wê, ya muhîm ew bû ku bihata nivîsandin; ku Iraq yek ji wan dewletên ku nîfuza şoreşa cîhanê lê belav bûye. Rejîma burokratî, wek siyaseta di hundir de, di ya jî derve de jî, nikarîbû bîyî tezwîr û xwe xapandinê, bimeşîya.

Bi riya terorê, zordestiyê û stemkariyê, hişt ku Seddam Husênê 53 salî bibe dîktatorêkî wiha ku tixûb jê re tunebin. Ew Serokcumhur e, Qaidê Hêzên Çekdarî ye, Sekreterê Giştî yê Partiya Baas e, Serokê Komîta Qiyada Şoreşê ye, Serokê Komîta Bilind a li Dijî bê Sewadîyê ye, "Egîdê Mîletê Ereb e" û qehremanê rizgarîya neetwîyê "Qaidê Tekegur e" wênên wî li her derê dardakirî ne.

Gotina Dawî

Bi belavkirina vî meqala tûj ku li gora pressa me ne normal e, redaksiyona "Argûmentî û Faktî" dibîne ku pêwîst e bête gotin ku me aliyekî tenê ji dîroka Iraqê ya nûjen ronî kirîye. Gerek bête îşaret kirin ku komunîstên Iraqê, piştî şoreşa sala 1958'an, di siyaseta xwe ya li hemberî Baasiyan de gelek şaşîyên ciddî, kirin. Vî tiştî hişt ku ew bi wan re bi hev kevin û xwîn birîje. Pîvana li ser rejîma Bexdayê di ciyê xwe de ye û rast e, lê nabe bî jî bîr kirin ku dîroka me jî, bi jenosîda dewletê a li dijî mîletê xwe û jî xeynî wî, dewlemend e.

Hukûmet tenê û diçin û ne bi wan divê hukim li ser gelan betê kirin. Û ew şîûrên dostanî û baweriyê ku xelkên Sovyetî û yên Iraqî pê dihesin, ewê bibin bîngêhên peywendiyên di nav me de.

Û gotina dawî heya nuha, nûnerên vî welatê yan vî partiya ku bi me re dost in dema ku nivîsekê di pressa Sovyetî de û li dijî xwe dibînin, pêre-pêre berê xwe didin Wezareta Derve ya Sovyetî yan jî Komîta Merkezîya Partiya Komunîst û protesto dikin. Û ew di wê baweriyê de ne ku ew materiyal di bin destên wan re derbas bûne.

Bi rastî jî berê, pîrê caran wilo bû. Di nêrîna me de wext hatiye ku bi awakî vekirî gotin bête gotin û ne zarûriye ew bibe regevdana nêrîna vî civata resmî yan ên din ku siyaseta me ya ji derve dimeşînin. Heger ew cî jî xercî rexne ne, divê ew jî bêne rexnekirin.

Ev nivîs ji alî Bavê Nazê ve ji rojname heftane ya Rûsî "Argûmentî û Faktî" - 27'ê Gulan 90' hatiye wergerandin.

Lêkolîn

Di gotina pêşiyê de em li ser çilonayeti û bîr raya Heqeyên Kurdistanê sekinîn û yê rastî be û karibe bê bahskirin hat nivîsîn ku çavê we pê ket. Herçî mamoste yê Şex Mistefa Eskerî û Mihemedê Mele Kerîm û Îzzeddîn Mistefa Resûl û Hemze Ebdullah û Elî Boskanî û Reûf Mihemed Zuhdî her yekî ji perspektîfêkê û bi gotarên kurt û jihevqetandî di du namilkên (broşurên) (Bizava Heqeyan) û (Bo le Heqe Kewtine Teqe) wiha gotine ku hemû li ser vê bizavê hatiye nivîsîn. Lê li ba min wiha ye ku gelek tiştê veşartî maye û bahsa wê nehatiye kirin.

Ji bo minê Kurdê Îranê ku ta derecekê mutalea min li ser bizavên mezhebî û ayînî yê Îranê heye ku hemû tişt ronî û eşkere ye û wek wezîfa xwe dizanim ku

Heme Sûr kî bû, çi kir?

Heme Sûr wek dibêjin, merivekî sor û sipî û çav şîn û qewî û kurt bûye û hinek dibêjin ku ji Xelkê Alan e, hinek jî dibêjin li Mawtê ji dayik bûye. Lê her çawa be, ya rast ew e ku Heme Sûr peyakî gundî û rênçber û bindest bûye û di piçûkî de jiyanê yekcar dijwar buhurandiye bi rebenî bedbextî û bêperetî jiyaye û çûye xaneqa Şedele, bûye mirîdê Xwedê jê xweş be; Şêx Ebdulkerîmê Şedele; pêşwayê Heqeyan û çend salan bi pişt darên (êzingên) xaneqê kêşaye xizmeta wê kiriye, piştîvan bûye ta zemanê ku merhûmê Şêx Ebdulkerîm koça dawî dîke û Heme Sûr bêpîrs û ray mêzer û eba Şêx Ebdulkerîm hildigire. Mêzerê(şaxîkê) li serê xwe dibeste û ebê davêje ser milê xwe xwe wek çîgirê şêx û pêşwayê Heqey-

nivîsî baweriya Heqeyan e. De na di tefsîr û şîrovekirinê de ne wiha ye. Her çibe, ew dibêjin:

"Ji ber ku me bawerî bi zatê Xwedê peyda kiriye û îmana me pê heye bi destûra vê ayeta pîroz nimêj li ser me ne ferz e."

Heme Sûr zaroanîne di nav peyrewên(mirîdên) xwe de qedexê kir û got Xwedê ferman kiriye ku(we'elemû we îne ma em-walûkum we ewladûkum fitne) bes çima ku ewlad fitne ye nabe ku bibe.

Heme Sûr vexwarina çayê li mirîdên xwe qedexê kir û bi a wî wiha bû ku çay hoyê paşdamayîna civakê ye.

Kar û mezra û mal kir bi giştî û bi şîrkayeti. Tovçandin, cotkirin û avdan û paleyî û gêre û bender hilanîn û meweçînîn bûn giştî, kes mafê wî tunebû ku karê

yan: Ji bo çi Heme Sûr vexwarina çayê qedexê kiriye? Ne tenê Heme Sûr lê Şêx Ebdulkerîmê Şedelê jî li xaneqa xwe vexwarina çayê heram kiribû. Di wê demê de ku Şêx Ebdulkerîm ji mirîdên xwe re got ku"çayê vemexwin" Heme Sûr li pişt xaniyê Xaneqê rawestiyabû xwe tevî qiseyên Şêx Ebdulkerîm kiribû û gotibû ku "Ez vedixwim." Şêx ku qiseyên wî hatibûn birrîn di bersîvdayîna Heme Sûr de got:

- Şêto, qesda min ne tuyî

Her ew Heme Sûr gava ew bi xwe bû şêx, çayê heram kir. Diyar e ku sebebê vî karî kêmbûna qend û şekir bû di wê demê de. Jê pêştir vexwarina çayê gelekî wexta karkir û cotkaran digirt û bi vî awayî mildana bi alî kar de xalf dikir.

Ya Siyem: Him Mame Reza û

mezirandine. Sedemê vî karî jî ew bûye ku wê demê Brîtaniya, Fransa, Almanya û hemû dinya xuran hay ji nefta Kurdistanê hebûne û her yekî wekî gurên birçî laşê welatê me bi aliyekî ve rakêşane. Bi şîyan-dina lêkolê û nivîskar û ramyarîzanên mezin ku niha meqsed û nehênîyên wan ji bo me ronî dibin di bîra wê yekê de bûne ku firqê, deste û eşayîrên ser bi xwe ve durist bikin.


Her wekî di gotara pêşiyê de min ragihand û hemû ew pirtûkên ku li ser firqeya Bahayîyên Îranê hatine nivîsîn îspat kirine ku peywendiya "Seyid Mihemed Elî Bab; Pêşewa û avakirê Bahayîyê ligel peyayên siyonîzmê û împeryalîzma cîhanê heye û ev jî alî hemû kesan ve eşkere ye.

Ew (Mihemed Elî Bab N.A.)

TERÎQATA HEQ

-2-

Umer Farûqî



xalên rastî binivîsim û bixim pêş çavên gelê Kurd û lêkolînan û aligîrên van bahsan.

Şaştiya pêşîn ew e ku gava em bahsa Heqeyan dikin ji hinekan wiha ye ku mebesta me Ehlê Heq ya Elî Îlahî û Hoza Goran in ku mamoste Sidiqê Borekeyî li ser wan lêkolînek berfireh kiriye. Lêbelê ev Heqeyên "Dare qule" tu pêwendiyên wan li gel Elî Îlahîyan û Ehlî Heqê Kirmanşahê, Krênd û Sehne û Xaniqînê nîne. Bileks ev bizaveke îrfanî ye ku ez dibêim qey bîna nefî jê tê.

Herçî hin kes bizavê, bi pêşkeftinxwazî, dij bi sermiyandarî û dagirkerî dizanin jî li vir ciyê piyên Mufetîşê Siyasî yê Brîtanyayî S. J. Edmonds; nivîskarê Kitêba Kurd, Tirk û Erebu ku yek ji more girîngên parvekirina Kurdistanê bû, tê dîtin. Loma bîhna nefta Babegurgurê jê tê. Lê belê her çî dibe bira bibe, Heqeyên Kurdistanê niha hene û şêx û xaneqa û tekyayên wan hene dubendî jî ketiye navbera wan û firqetek hejar feqîr ji wan derketiye ku Heme Sûr ji wan bûye.

an îlan dîke. Lêbelê mirîd û kur û braziyên şêx, li ber radibin, ne ku her wî nakin şêx wî jî Şedelê jî derdixin. Heme Sûr bi vê derxistinê dest bi hewar û gaziye kir ku erê ez çînişnê Şêx Ebdulkerîm im lê zulm li min hatiye kirin. Bi vî awayî mabênêkê çû Kerkûkê, paşê vegeyriya avayiyêke bi navê Kulawqut, pêşewazî lê hat kirin û bû pêşewazî xelkê wî gundî. Ji dorûberê jî xelk lê kom bûn wî kirin pêşewazî xwe, wek Heme Sûr hat naskirin.

Şêx Heme Sûr di destpêkê de hin adet û qanûn ji bo mirîdên xwe danîn ku piraniya wan her ew edet û qanûn bûn ku Heqeyan û Şêx Ebdulkerîm bawerî pê dianîn. Lê Heme Sûr jî ji bo wê ku bid'et û adet û qanûnên nuh anîbe çend tişt lê zêde kirin. Yekem ew bû ku Heqe nimêjê wek sunet dizanin. Diyar e ku ji ber vê baweriyê em dikarin bêjin ku ne musulman in lê belê ew dibêjin, Xwedê ferman kiriye ku (Wescid lî Rebbîk, heta yatîk el yeqîn) yanî secde bive ji bo Xwedê ta danê ku baweriyê pê peyda dikî. Helbet vê mana ku min

cihê bike, lê hemû peyrewên Heme Sûr di zîraetê de di dexl û dan de û di pûl û mal de şîrk bûn bi hev re karê xwe dikirin û qasî hev dixwarin, kes ji kesî zêdetir nebû.

Jin li ba wî xwediyê maf û hûqûqê beranberî yê temam li gel peyan bû û her jin û her mêr mafê wî hebû ku rexne bigire û raya xwe eşkere bike û pêşniyariyên xwe bêje.

Îcar di van xalan de çi qas mebestên girîng tên dîtin? Ya pêşîn, gelo ji bo çi Heme Sûr çêbûna zarokan qedexê kir? Dibêjin ku bi xwe mirovekî çarereş û bedbext bûye, wer dizanî ku eger malbat gelek be dê û bav nikarin baş zarokên xwe xwedî kin. Loma berî hemû tiştî pêşî li pîrbûna zarok û civakê girt. Îja eger baweriya Heme Sûr bi wê ayeta pîroz bê, di wê derê de mal û zarok wek fitne tên dîtin, ji bo çi gelo wî mal baş zanibiye û zarok fitne?

Loma derdikeve ku bes sedemê fetwa Heme Sûr vedigere ser jiyana wî ya pîrî bi meynet û belengazî ku nexwestiye peyrewên wî wek wî birçî bimînin. Ya dudu-

him Heme Sûr baweriya wan bi wê yekê hebûye ku yek ji himên tesewufê qenaet e. Bi gotina Mame Reza xelk divê tê bigihên ku qenaet çi ye.

Bi vî awayî eger civakek çêbibe ku feqîr û dewlemend tê de nebin û kes bi hoyê wê yekê ku mal û milk û pûl û zeviyên wî ji yê din zêdetir nebe, çîna serdest a civakê nebe û tekqerar bin û bi qasî hev bixwin. Ev qenaetê di nav gel de peyda dîke.

Him Mame Reza û him Heme Sûr fermana jiyanek hevbeş dan mirîdan lê ev mebest di nav Heme Sûran de xurtir û bi hêztir e. Mirîdên wî beyî hev nikarin sêveke jî darekê bikin, hemû malên wan bi şîrkati ye û qasî hev e. Helbet bi baweriya min Heme Sûr û mamostayên din rewşa rênçber û xelkê bindest ku hilak ketin ji destê sermiyandarî û derbegî û çinayeti baş dîtine û destnişan kirine û wan bi dûr xistine ta ku bi fermanên mamosteyên Brîtanî êrîş birine ser bîr û baweriyên ayînî û nimêj dane alîkî û Heme Sûr jî li dijî zaro aniya xelkê rawestiyaye. Bi ew awe bidetan dîne nuh da-

qasî du salan li Kurdistanê Iraqê jiyaye û diyar e temas ligel şêx û mirîdên Kurdistanê daniye û gelek kes dibêjin sedemê derketina Heqeyan û Heme Sûran her netîca kirin û bîr û rayên Seyid Mihemed Elî Bab e ku helbet pêşewazî Heqe vê yekê vedîşêrin. Lê ji alî xelkê ve ne veşartî bûye. Mixabin ku mamoste û lêkolêrên Iraqê jî nikaribûne ku tehqîqek baş têxin pêş çav û meselê ji bo me ronî bikin. Bes du broşur li ser vî ayînî hatiye nivîsîn ku yek jê "Bizava Heqe" ye ku Şêx Mistefa Eskerî ku bi xwe Şêxê Heqe bûye nivîsiye û ya duduyan "Bo le Heqe Kewtine Teqe" ku kak Reûf Mihemed Zuhdî nivîsiye û ew jî peyrewê(mirîdê) Heqe ye û diyar e kes nabêje dewê min tîrş e. Her wiha kesek du kesan ji komunîstên Kurdên Iraqê jî perawez ji bo kitêbê nivîsîne ku diyar e ew jî ji kîjan alî ve bê kuştin kara wan tê de ye.

Ji Kovara Sirwe Hejmar: 25-26

Joe O'Sullivan: "Kurd Îrlandiyên Rojhilata Navîn in"

"Hevalê hêja, ez navnişana dostekî ji te re dişînim ku ew endamê PEN'a Awistralyayê ye". Mehmed Uzun di noma xwe de dinivîsine. Navnişan xuya dike ku Joe O'Sullivan li bajarê Perth dimîne. Dilê min hebekî sar dibe, ji ber ku Sydney li rojhilata Awistralya ye û Perth jî li rojava ye, bi trêne sê rojan rêwîti...

Roj û meh derbas dibin û rojekê nameyek tê: "...Ez ji bo çend hefteyan tîm Sydney. Ezê bi dîtina merovekî ji dostên xwe yên Kurd pîrr dilşa bibim. Telefona min li Sydney...."

Em di axaftineke telefonê de li hev dikin, emê hev du li pêş Mala Belediya Sydney bibinin. Emê çawa hev du binain? Joe dibêje, "Ez 70 salî me, porê min sipiyê zîvîn e...." Heftê salî! Mehmed Uzun ew li Kanada dîtîbû, bahsa wî kiribû, lê bahsa temenê wî nekiribû.

Li pêş mala belediyê bi sedan kes diherin û tîm, herkes li benda yekî, yan yekê ye. Ez li dor xwe dinêrim, çavên min li yekî dikeve, porê wî sipiyê zîvîn e, lê li ser xwe ye, heftê salî xuya nake. Ew jî li min dinêre, em ber bi hev diçin û destan dirîjî hev dikin.. Joe dibêje min qet bawer nedikir, ezê li Awistralya dostekî xwe yê Kurd bibînim, Bîst sal in ku li Awistralya ye, jî Îngilîzîtanê hatiye, Îrlandî ye. Ev hemî jî bo min normal in, lê di mējîyê Joe O'Sullivan de gelek rêzên li ser sedsala 20'an hene û di wan rêzan de jî pîrr tişt di derheqê Kurdan de ye, ku Kurd bi xwe jî pê nizanin.

Rojeke îniyê Joe, jina wî Zina û torinê wan Tobî li mala me dibin mêvan. "A diya vî li Kurdistanê bû" dibêje Zina, "li Kurdistanê bi ser lîngan ket." Ez di nav jînenê Kurd de yan di konan de yan jî li ser xaniyan radiketîm. Ez wê

Pîrs: Berêz Joe O'Sullivan, ez kêfxweş im ku li Awistralyayê rastî serleşgerê hêzên Îngilîz bêm, ku ew di Şerê Cihanê yê Duyem de kapitanê komek leşgerên Kurd bûye. Hûn bi karibin, bi kerema xwe, me agahdar bikin, ka wê yekê çawa dest pê kir?

Joe O'Sullivan: Ez jî kêfxweş im ku li Awistralyayê rastî Kurdan tîm. Cara yekem, min Kurd di sala 1944'an de dîtîm, wê demê ez ji bo yekîtiyê hêzên "paraşûtvan" (Number 1 paratroop Squadron) hatibûm şandin; ev li Barf bû, li Îtalya. Endamên wê hêzê li Balkanê di kar de bûn; li

Albanya û Yûnanîstanê. Karekî wan ê taybetî hebû, êrişbirina ser rêçikên zexîreyê leşgerên Almanan. Destpêkirina wê hêzê wisa bû: Dema di sala 1919'an de li gor Peymana Versille rêberiya (mandate) Iraqê ket dest Îngilîzîtanê, Îngilîzîtan biryar standin ku ewê leşgeran bi kar neynin. Li şûnê, ewê, kontrola jî hewa bi kar bînin, ji ber ku mesrefa wê hindiktir e. Ji bo vî karî, wan 15 refên(squadron) firokan kirin kar û jî kesên ne Îngilîzî hêzeke leşkerî damezirandin, bi navê "Levies". Ev hêza jî Asûriyên li çiyayê bakûrê Iraqê û jî kesên Kurd çêbû. Di sala 1941'ê de leşgerên Iraqê li dij hukûmeta xwe tevdira

dema jiyana xwe ji bir nakim, hê her tişt li ber çavên min in, tenê min pîrr nav jî bir kirin..." Em li ser Kurdan û rewşa wan diaxifin, li ser serihildana li bakûrê Kurdistanê, li ser bikaranîna çekên kimyayî û valakirina gundên başûrê Kurdistanê. "Joe dibêje Kurd jî wek Îrlandiya ne, herdem yên din ew bi kar anîne. Ez tîm dibêjim, Kurd Îrlandiyên Rojhilata Navîn in..."

Em li hev dikin, ku ez hevpeyvînekê li gel wî çêbikim, li ser Kurden di Şerê Cihanê yê Duyem de ku jî Îngilîzîtan re eskerî kirine. Merovekî ne Kurd wê li ser beşekî dirokê bi axîfe, ku tîkiliya wê bi diroka neteweyê Kurd re heye. Hejmareke ne piçûk ji Kurdan eskeriya Îngilîzîtan kirine, gelek eskeriya Frensa jî kirine û heta Afrikayê çûne, hejmareke ne piçûk tev hêzên Yekîtiya Sovyet eskerî kirine. Lê di nav Kurdan de ew ên ku bi şeweyeke bi rîk û pêk li ser van bûyerên dirokî nivîsandine pîrr hindik in. Ji bo gelekî bê dewlet dirok herdem jî hêla yên din ve jî wan re hatiye nivîsandin. Kurdan eskerî jî Tirkî re jî kirine, jî Ereban re jî, jî Farîsan re jî...

Berî em dest bi hevpeyvîna xwe bikin, Joe dibêje: "Wek merovekî Îngilîz gotiye, yên xwedî hêz dirokê li gor daxwaza xwe dinivîsinin." Erê, ev rast e, lê yên bê dewlet û jî her tiştî bêpar dimînin.. Ez di dilê xwe de dibêjim. Erê emê bi Joe O'Sullivan re biaxifin. "kapitanekî" komeke Kurd û Asûriyan, yên ku wek hêzeke nemaze ya şerê Kaşan-Mountain paratroops- di Şerê Cihanê yê Duyem de li Ewropa û Rojhilata Navîn di leşkeriya Îngilîz de bûne.

Şahîne B. Soreklî



Joe O' Sullivan "Kurd bi heybet bûn û gel

înzilabeke leşgerî kirin û hêzên Alman(hêzên Axis) vexwendin Iraqê û êriş birin ser hêzên Levîses (leşkerên Asûrî û Kurd) bi ser neketin. Dûra hejmare endamên wê hêzê bêtir bû; bawer im hejmar Kurdan tî de gihîşt 2000 kesî, jî Kurden Sûriyê, Iraqê û Îranê. Van Kurdan li welatên Rojhilata Navîn, li Filistîna wê demê, li Urdunê, li Sûriyê, li Qibrîsê, li Îranê û li hevêkên Derbenda Farîsî(Persian Gulf) leşkerî dikirin. Bawer im karê wan yê herî girîng parastina rêçikên zexîreyê ku jî hêla Hevalbendan ve jî Rûsya re dihat şandin bû, çimkî çî riyên din xeynî jî derbenda Farîsî tunebûn; di wir re û di ser kaşan û di neqeba

Rewandûzê re diçûn Îranê û di-gihîştin başûrê Rûsya. Kurd û Asûrî bûn, yên ku ev rêçikên zexîrê diparaztin.

Di sala 1943'an de komeke taybetî hat çêkirin, komeke "paraşûtçiyên" çêkirin, ji bo ku li şûnê di destên dijîmin de têkevin kar. Di wê hêzê de 75-100 kesên Kurd û li dora 100 kesên Asûrî hebûn. Di Tebaxa 1944'an de ew şandin Îtalyayê, wek Paraşûtçiyên Çiyân (Mountain Paratroops) Şerê wanê yekem, şerekî ecêb, li Albanya çêbû. Di wê demê de hêzên Alman jî hevêkên Derya E-gêyê, şûnê wek Kârfû, yê paşve dikîşyan. Îngilîzîtan, Hevalbendan, biryar standin ku têkevin bajarê "Seran-

dê", li Albanya, ji bo ku rê li leşgerên Alman yên vedigeriyên mal bigirin, tev hêzên din yên li dij Almanan, wek partîzanên Yûgoslavya bi serekîtiya Tito. Hêzên Îngilîz 500 komando bi rêkirin ji bo ku vî bajarî bi dest xî, lê nikaribûn, ji ber ku hêzên Almanî kaşekî stratejîk li deryayê bajêr xistibûn destên xwe û rewşa bê jî pîrr xirab bû. Leşgerên Îngilîz nikaribûn jî peşve biçin. Loma ev kar dan Koma Paraşûtçiyên Çiyân. Ev hêza, bi rîya deryayê gihîşt Albanya, lê 30 km. li başûrê bendera Serandê hatin danîn. Tevdîr ew bû, ku ewê berê wî kaşê di destê Almanan de

Nûçegihanê me yê Moskoyê Bavê Nazê bi "leşkerê nenas" yê Kurdnasiyê Ruslan Lazereviç Sabelov re ev hevpeyvîna balkêş çêkir.

Armanç: Bi xwe ji bextîreşîya me ye ku em ne di wexta xwe de alimên ku mijûlî dirok, edeb û zimanê Kurdî dibin, nas dikin. Û hûn jî yek ji wan aliman e. Ji ber wê yekê emê ji neçarî wê pîrsa teqlîdî bikin; ji kerema xwe re, hûn dikarin xwe bi xwendevanên Armançê bidin nas kirin?

Sabelov: Helbet, çima na? Navê min Ruslan Lazereviç Sabelov e. Sala 1926'an li Viladikafkas ji dayika xwe bûme. Sala 1952'an, min li Lenîngradê ûnîversîtê xilas kir. Têma dîploma min li ser zimanê asîyayî bû. Piştî ûnîversîtê, min di vî warî de xwendina xwe berdewam kir. Û sala 1955'an li Înstîtûta Zimanzanîyê a Moskova min nama doktora xwe top kir. Lê belê dok-

tora dewletê min sala 1978'an parast û têma wê li ser giramera Kurdî ya dirokî bû.

Ji sala 1959'an û heya roja îro, ez li Înstîtûta Rojhilatnasiyê ya Akedemiya Îlmî ya Sovyetî kar dikim. Xebata min ji roja pêşî û heya nuha li ser zimanê Kurdî ye.

Armanç: Gelo hûn dikarin ji me re bêjin, we çima zimanê Kurdî kire meydana xebata xwe?

Sabelov: Berî her tiştî ez dikarim bibêjim ku lê hatin bû. Rojekê min Qanêdê Kurdo li Moskoyê dît.(Me li Lenîngradê hev du nas dikir) Wî jî min re got; çima tu naxwazî mijûlî Kurdî bibî? Dûre ez li ser wê pêşniyarê fikirîm û min biryara pozîtîv stand. Diyar bû ku min ev biryar stand ji ber ku meydana zimanê Kurdî kêr nas bû. Bi xwe ji merivên lê kolînger re qada herî nenas balkêş e. Û min jî da ser wê şopê. Pirtûka yekemî ku ez pêrgî wê hatime ya alimê Almanî Sotsînî bû. Navê pirtûkê bi Almanî ev e: "Grundris der Iramisehen Phillogie" Bi xwe ev berhem pîrr mezîne û ji sala 1898 û

heta 1923 beş bi beş belav dibû. Û wek kitêb sala 1903'an li bajarê Strasbûrgê çap bû. Ev pirtûka yekemî bû ku min li ser diroka zimanê Kurdî xwend.

Pirtûka duyem di vî warî de ya Justî bû: "Kurdische Grammatik" di sala 1880'î de li Almanya derketibû.

Hemû di yek nêrîne de bûn ku zimanê Kurdî ji koma Îranî ye. Lê malûmat li ser diroka zimanê Kurdî di destên wan kesan de pîrr kêr bûn. Dibe jî ber wê çendê be ku wan hertîm mûqayese bi zimanê Farîsî re dikir.

Armanç: Lê piştî wan û niha?

Sabelov: Ji wê çaxê û heya nuha di diroka koma zimanê Îranî de gelek guhertin çêbûne. Gelek malûmat hatine civandin. Bi rîya wan berhevdan û lêkolînan zimanên ku di dirokê de nenas bûn, belu bûn. Wek numûne:

1- Zimanê Soxdî(ew zimanê mirî tê hesêb), Ew jî zimanê koma Îranî yê Rojhilat e. Piraniya kesên ku bi vî zimanî dipewvîn, li Asya Navîn diman. Ev ziman heya qimê 9'an hebû.

Ruslan Lazereviç Sabelov:

"Zimanê Kurdî, zimanê tu şika ilmî di vî"

2- Zimanê Partî. Xelkên bajarên Turkmeniya û Xoresanê bi vî zimanî dipeyvîn. Ev ziman jî, ji yên mirî ye.

Bi dîtina van jêdaran, divyabû ku ez ji bo lêkolîna xwe dîfrasetê bikim da ku diroka zimanê Kurdî bi awakî durist bête dayin...

Armanç: Û hûn gihîştin çî encaman?

Sabelov: Em gihîştin wê netîcê ku erê, zimanê Kurdî zimanekî serbixwe ye û tu şika ilmî di vî warî de nîne. Û ku şik bête ser jî mebest wê tenê pê siyasî be.

Bi xwe ji destpêkê jî çî şik li cem alimên berê tunebû ku zimanê Kurdî ne zimanekî serbixwe ye û niha jî tu şik li cem kesî nîne..

Armanç: Çî zahmetî hatin pêşîya we?

Sabelov: Bi xwe, ez navê zahmetiyê lê nakim. Ez dibijem ku di metodîka xwe de, berî her tiştî divyabû ku em li ser mesderê gotinên Kurdî rawestiyana. Helbet bêyî wê yekê nabe ku lêkolîn li ser fonetîka zimên bibê. Diroka koma zimanên Îranî, bi taybetî, bi rîya pêşketin û cûdakirina fonetîka wan jî hev tenê derxistin. Û zimanê Kurdî berî her tiştî bi saya pêşketin û paqijkirin fonetîka xwe, ji koma xwe serbixwe bûye.

Di vî warî de gelek hatiye nivîsandin. Bi taybetî alimê Almanî Andriyas, Têdesko û yên Îngilîzî Makin jî, li ser wê babetê

HEVPEYVÎN HEVP



Joe O' Sullivan kî ye?

Joe O' Sullivan li Cork, (Îrlandî) di sala 1919'an de ji dayika xwe bûye. Ew iro li Perth; Awîstralya, dimîne, ew sekreterê rêxistina PENê ye. Ew berê li Awîstralyayê serekê vê rêxistinê bûye. Joe O'Sullivan bavê 5 zarokan e û bi 8 torînen xwe gelekî dilşa ye. Wî û şiya xwe Zena hevûdu li bajarê Qahirê di sala 1945'an de naskirine.

Di salên Şerê Cihanî yê Duyem de Joe O'Sullivan di nav hêzên Îngilîzî de(The Royal Air Force) serleşger bûye û piraniya va salan li bakûrê Afrîqa, Îtalya û li welatên Balkanê derbas kirîye. Li wir serleşgerê(Group Captain) hêzekê paraşûtçiyân(Paratroops) bûye. Endamên vê hêzê kesên Kurd û Asûr bûne. Ev hêza wek hêzekê şerê çiyân hatiye bikaranîn.

Piştî qedandina Şerê Cihanî, Joe O'Sullivan tev leşgerên xwe vegehiyaye Kurdîstana Iraqê. Ew, jina wî û du zarokên wan di nav Kurdan de mane. Keça wî ya herî mezin li Kurdîstanê bûye û li wir bi ser lîngan ketiye. Joe O'Sullivan li ser vê keça xwe wisa dibêje: Ev keça min meroveke xwînşerîn û çeleng e. Helbet ewe wisa be, ji ber ku ew li Kurdîstanê hatiye dinê û di nav Kurdan de bi ser lîngan ketiye."

Joe O'Sullivan dibêje, " Piştî derketina ji Iraqê peywendiyên min li gel Kurdan hatin birrîn, di sala 1989'an de ez li Holanda û li Kanadayê rastî nivîskarên Kurd hatim. Iro dostên min yên Kurd car din hene. Ez bi hevvaltîya wan pîrr dilşa me. Nuha tevdir û planên min hene, ku ez pîrs û tekoşîna gele Kurd bêtir bîdim naskirin.

wan bajarên mezin hema-hema nedîtibûn. Tevî ku ew kesên gundî û çiyayî bûn jî, wan bi jîrî şer kir û di dawiyê de em bi ser ketin. Li Atînayê me ji hêla merovan ve pîrr zirar kir. 25-30 leşgerên me hatin kuştin, li dora 5 kesan endamên vê komê bûn. Ev hejmareke bilind e. Bi qasî vê hejmarê, hebekî bêtir, birîndar bûn. Vî şerî em gîhandin Adara 1945'an, şer digihîşt dawiya xwe. Biryar hat stendin, ku sûda vê komê êdî li Ewrûpa nema. Baştir e vegere Iraqê. Wisa, em vegehiyan Iraqê. Di vê demê de hejmara Kurdên di leşgeriya Îngilîz de bi tevahî li dora 1000 kesî bûn. Ew wek leşgerên nîzami man, heta sala 1948'an, dema Îngilîzîtanê Peymana Portsmouth îmze kir û diviya bû leşgerên xwe ji Iraqê derîne û karbidestîya welêt bide Iraqîyan. Ez bawer im, bendên peymanê ji 1952'an û şûnve diketin pratîkê. Me 2-3 salên din li wir derbas kirin, me leşgerên xwe ji bo jiyana medenî amade kirin. Min demeke dirêj li herêmên Barzaniyan derbas kir, tev van leşgeran ji bo alfkariya wan, ji bo bicîhkirina wan. Hejmarek ji wan ketin eskeriya Iraqê, leşgerên zorferbûnî bûn. Di sala 1952'an de ez vegehiyam Ewrûpa û pêwendîya min bi Kurdan re hat birrîn. Dibêta ya rast bibêjim, ez ji wê demê û şûnve rastî Kurdan nehatim, ta ku min di Adara 1989'an de li Maastricht, li Hollende, nivîskarên Kurd dîtin. Ew mat man, ku Kurdan tev hêzên "Hevalbendan" şer kirine, di Şerê Cihanî yê Duyem de.

Di dema bikaranîna çekên kîmyayî li hember Kurdan, min ji Wezîrê Pêwendiyên Derve re nivîsand û bikaranîna ev çekên bêtar protêsto kir. Min herweha name ji rojnamê Îngilîzî re nivîsandin. Dûvre min pêwendî bi Lord Kilbracken, Serokê Koma Hevalbendiya Îngilîzî-Kurdî girêda. Ew jî mat ma ku Kurdan tev hêzên me şer kirine.

Dûmahîk r. 9

soz bûn. Cara yekem, min xwe tev leşgerên Kurd bi paraşûtê ji balafirê avêt xwar"

bidestxin. Li milê din, leşgerên Îngilîzî û partîzanên Yogûslavî wê ji alfî din ve êrîş bikin. Qumandarê hêzên Almanî dîvre got, wî komandoyên Kurd û Asûriyan li binaniya kêş dîtibûn û êrîşa wan di çav xwe re kiribû, lê wî ji leşgerên xwe xwestibû ku berê firavîna xwe bixwin, ji ber ku hilperikandina vî kaşî ne hêsan bû, kesekî nikaribû hewqa zû xwe bigihînda ser. Wî hesabê xwe nekiribû, ku van kesan li çiyayên Kurdîstanê bi ser lîngan ketine û ew bi rev bi keşan de hildiperikin. Leşgerên Alman hîn xwarina xwe dixwarin, tew ên me gihîştin serê kêşin. Di vê

operasyonê de tenê serleşgerekî vê hêzê û 10 leşger hatin kuştin; 15 jî birîndar bûn.

Pîrs: Ev hêza Kurd û Asûriyan, ma serleşgerên wan jî wan bû?

Joe O'Sullivan: Erê, serleşgerên Kurd, Asûrî û Îngilîz hebûn. Du serleşgerên Kurd hebûn. Ew bi navên Rebxemşî dihatin nasîn, yanî serekên 50 leşgerî, bi Kurdî. Yek Rebxemşî Umer Mewlûd bû, yê ku herweha bi navê Casim dihat nasîn. Yê din, Rebxemşî Tewfîk Beg bû. Yek jî êla Barzaniyan bû, yê din jî Kurdên Îranê bû. Endamên vê hêzê tev dîlan-êşîran- ji Albanya derke-

tin. Ew ala Naziyan ya mezin sor, ala "swastîka", ya ku wan li Albanya bi dest xist iro jî li entîkxaneyê Royal Air Force dimîne, li Yorkshîr e. Ev hêza ji bo vê serketinê pîrr hat pesindan. Di vê operasyonê de wan cesaret û jîriya xwe îspat kirin. Lê şerê herî dijwar yê vê hêzê li Yûnanîstanê hat meydandê. Ew dûre çûn wir ji bo derxistina Almanan. Li wir, em di şerê di navbera hêzên hukûmeta Yûnanîstanê û komunîstan de ketin belê. Hêza komunîstan ji kesên Bûlgarî, Yûgoslavî, Makedonî û Yûnanî pêk dihat, ku hukûmeta Yûnanîstanê nedipejirandin. Hemû bajarê Atînayê, meydaneke taxekê ne tê de, ketibû destên wan. Em, hêza ji leşgerên Kurd û Asûrî, tev

hêzekê leşgerên Îngilîzî(ji beşê Airborne) ketin Atî-nayê, me sefirê Îngilîzîtanê, yê ku li Otêla King George V bû, xilas kir. Li wir me li dora 3 mehan şer kir. Şer zor dijwar bû, ji ber ku di bajarê de bû. Ji şerê nav taxan tehlûketir şer tune ye, çinku tu dijmin nabînî, tu nikarî çekên mezin bi kar bînî, tu û neyêr pîrr nezîkî hev in û merov nîzane kî neyar e, kî kesê medenî ye. Her roj seet di 10'an de me rê dida xelkê ji bo ku biçin zexîfeya xwe bikin; me nedixwest em zirarê bidin kesên medenî. Kesên neyar jî ji vê yekê sîd digirtin û derdiketin. Ez di wê baweriyê de me, ku leşgerên Kurd û Asûrî di şerê Atînayê de zor baş şer kirin, ji ber ku ew kesan ne kesên bajarî bûn,

lanekî serbixwe ye warî de nîne"

nivîsîne.

Armanç: Û xebata we di vî warî de çiyê?

Sabelov: Di sala 1976'an de pirtûka min ya bi navê "Fonetîka Zimanê Kurdî" derket. Û di babeta gramerî de jî pirtûka min, "Dîroka Morfolojîya Zimanê Kurdî" di sala 1978'an de belav bû. Ji bilî van, min di sala 1986'an de jî cilda yekem a ji "Fehenga Eslê Peyvên Kurdî" daye çapê.

Armanç: Pêla Doktor Ruslan Lazereviç Sabelov ev berhem ji min re bi nav kirin, min jî ber nenasîya xebata wî, ji xwe şerm kir. Û min jê pîrsî: Heya nuha hûn li ku bûn? Çima hûn

wilo dûrî konferans û çalakîyên Kurdan e ku kes we nabîne?

Sabelov: -Milê xwe hejand û got- ez ji ku zanim!

Armanç: Wê gavê cildê yekem ê Fergengê hîn belav nebûye?

Sabelov: Erê, tevî ku ji sala 1986'an ve li çapxanê di dorê de ye.

Armanç: Piştî ku hûn mijûlî zimanê Kurdî dibin, mana xwe, hûn bi zimanê Kurdî dizanin. Heger erê, hûn dikarin ji me re bêjin, hûn li ku fêrî wî bûn?

Sabelov: Li Ûnîversîta Lenîngradê, li nik rehmetyê Qanadê

Kurdo hînî zimanê Kurdî bûm.

Armanç: Ji kerema xwe re hûn dikarin bêjin, materyalên ferhengê ji ku de rê ne?

Sabelov: Mada Kurdiya nûjen ji pirtûkên Erep Şemo, Heçiyê Cindî, Qanadê Kurdo û ji tekstên folklorê Kurdî ye. Ev materyalên Kurmançî ne. Û herçî yên Soranî min ji Hejar, Q. Koyî û yên din dane hev.

Armanç: Ma hûn tekstên folklorê ji Kurdiya nûjen dihesibînin?

Sabelov: Herê, helbet.

Armanç: Ez dibînim ku materyalên ferhengê piraniya wê ji berhemên nivîskarên Kurdî Sovyet in. Bi xwe em pê dizanin ku ew, ji çarçewa devoka xwe dernakevin. Û ji aliyê din ve, ew pîrê caran bi awakî bê mane gotinên Erebi bi kar tînin, ev kêmasî ye..

Sabelov: Rast e. Lê ezê çawa bikim? Piraniya Kurdên Kurmanç li Tirkîyê dijîn û zimanê Kurdî qedexeye. Li Sûriyê jî, ji

bilî çend hejmarên "Hawarê" iştêk neketiye destên min. Herçî Kurdistana Iraqê ye li wira pirtûkên Kurmançî pîrr kê m in...

Armanç: Ha, hûn nîzaniyan ku di van salên dawî de, li Ewrûpa û bi taybetî li Swêdê bi dehan pirtûkên bi zaravê Kurmançî belav bû-ne?

Sabelov: Mixabin pirtûkek jî ji wan neketiye destê min.

Armanç: Pirtûkên ku li Ewrûpa derdikevin heger têkevin destên we, hûnê karê xwe li ser ferhengê bidomînin?

Sabelov: Helbet. Bi xwe xebata eslên peyvyan tu carî tamam nabe. Û ku ew pirtûkê tekevin destê min, ez dibêjim ezê gelekî qezencê ji wan bibînim. Hûn bala xwe bidinê; carna gotinek bi min re derbas dibe; lê ez dikim û nakim ez nikarim hevokekê wek numûne bibînim. Carna ez ji xwe dipîrsim; gelo Kurd vê gotinê çawa bi kar tînin?

Armanç: Gelo hûn bêjeyên ferhenga xwe çawa bi nav dikin?

Sabelov: Pêşî ez gotina Kurdî bi Kurmançî û bi soranî datînim û mana wan bi Rûsî didim. Dûre ez numûnê ji ber teksta Kurdî ku ew gotinê de bi kar hatiye, tînim. Wê bi xwe jî werdigerînim Rûsî. Heger peyva Kurdî ji yên kevin be, ez forma wê ya Îraniya kevin tînim. Û ku formên weke wê di zimanên Îranî de hebin, êdî ez wan jî datînim ber hev û nav lê dikim. Lê ku gotinên Kurdî, ji zimanekî din hatibe, wêga ez didim xwiya kirin ku ew ji ku hatîye.

Armanç: Cilda pêşî ya ferhenga we hecmê wê çiqas e û heya kîjan tîpê ye?

Sabelov: Divê bête gotin ku ez ne hemû gotinên Kurdî derbasî ferhenga xwe dikim. Tenê ez kokê bi kar tînim. Tevî vê jî cilda yekem nêzî 1200 rûpelên deqîloyê ye. Û ji A heya M'ê ye.

Armanç: Û cilda duyem?

Sabelov: Bi xwe xebata min nuha li ser wê ye.

□

Çîrok

TIRÊN

"Xewn ji me çê dibin wek ku
em ji xewnan çê dibin"
Louis ARAGON

Dr. Kurdo Husên



Xisro û Yaşar di istgeha(istasyon) pîrr mezin de bûn û rîya li pêşiya wan dirêj bû, pîrr dijwar dixuya. Wan pasaportên xwe, tev bilêtan xistibûn bêrikên xwe û li hêviya tirênê, li ser sînga istgehê, wek ku agir di bin wan de bûya, ew diçûn û dihatin. Istgeh bê hawe fireh, dirêj û pehn dixuya û lampên sipî yên di sînga ban de, bi sedan bûn û wan ronahî didan û çawên rêwiyan pîrr kêr diçe-witandin, kor dikirin. Xisro ew dera han pîrr mezin dît û wî nizanibû gelo mezinbûna istgehê ji kêmbûna kesana bû yan bi rastî ew wilo bê hawe fireh bû. Li ser rîyên hesinî, tirênan, mîna lawîrîn westiyayî, bêhna xwe berdidan û xwe amade dikirin ji bona derên pîrr dût. Li ser du textên reş, yek ji bona çûnê û yê di ji bona hatinê, navê bajaran û numrên tirênan li ser hev dihatin, navin wînda dibûn û navin din derdiketin û ciyên xwe, li ser rûyê textên reş çê-dikirin. Xisro û Yaşar wê li tirêna ku diçû Kurdistanê siwar bibana. Di serên wan de, navên bajarên wek Diyarbakir, Mêrdîn, Qamiş-lokê, Zaxo, Kerkûk, Helebçe, Mahabad, Qesra Şî-rîn û navên çend bajar û gundên din dijîyan, rengareng dibûn.

Niv seet li ber wan mabû. Yaşar siwar bûbû, ciyê xwe di tirênê de peyda kiribû, li kêleka pencerê rûniştibû û li hêviya Xisro bû. Xisro, bi xwe, hîn di hundirê istgehê de bû û dixwest çend tiştan bikire. Rê li ber çavên wî, di serê wî de, pîrr dirêj û dijwar dixuya û wî bawer dikir ku wî hîna xwe baş amade nekiriye. Di bin asmanê ban de, di nav ronahiya sipî ya lampan de, wî cixare li dû cixarê di-kişand. Wî dixwest çî bikirîya? Di serê wî de pîrr tişt hebûn, lê wî nikaribû barê xwe pîrr giran bikira û ji ber vê yekê wî xwest, di wan sîh deqên mayî de çavên xwe tîr bikirana ji dîtina

tiştên ku dê ji ber nêrinên wî wînda bibana. Ji mêj ve, ji demek pîrr dirêj ve, ew li bajarê Parîsa mezin û tevlihev bi cî û war bûbû. Li ser diwaran, posterên mezin-ilanên pîrr mezin- hebûn û wan pesnê textên razanê, xwarinê, vex-warinê, kincan, bêhnên Ferensî û dermanên ji bona xweşikirinê didan. Çavên Xisro li laşê jineke pîrr xweşik ket. Laş zer û sipî bû û ronahiya lampên istgehê li ser tilmên paşiya şa-hitok dişemîtîn û di qelş û kortalên laş de wînda di-bûn. Keça pîrr ciwan ava pirtiqalan vedixwar. Ew lêv bi ken bû, bi herkesî re di-bişirî û diranên wê yên wek berfê sipî di nav lêvên wê yên sor û dagirtî de bi hezaran ramûsan belav dikirin û dixwestin. Postera -ilana- ji bona ava pirtiqalan av bi devê Xisro xist. Du sê kes bi kumên reş, bi paltoyên reş, bi şelwerên reş, bi gore û solên reş, mîna reşikên şevê bi lez di nav ronahiya istgahê de buhurîn û qurpe-qurpa paniyên solên wan li ser kevirên şahitokê Xisro ji nav pêlên xewnan derxistin. Lê dengê solan û dengdanên wan zû belav bûn di nav bêdengiya cî de Xisro bi nermî, bi giranî, cardî jî, nêrinên xwe li ser laşê tazî gerandin û paşê, ber bi tirênê ku ketibûn rêzê ve çû. Wî ji xwe re got ku hîna wexta min pîrr heye, ez dikarim ji xwe re ji bona rîya dirêj çend pakêtên tûtina xweş ya Amerîkî bikirim û çavên wî li nîşana li jora dikanên tûtinê bi bêhtengî gerîyan. Dikana tûtinê ku ji mêj ve girtibû û di nav qirçe-qirçe diranan de, Xisro çend xeberên pîrr pis ji xwediyê wê re dan. Bêhna wî, wan demên dawî yên berî ku ew biryarê bide vegra welêt, zû teng dibû. Lê di kuçekê de, di derek hinekî xewle de, mekîna ku pakêt didan hebû. Xisro cizdanê xwe yê peran derxist û piştî ku zû tûtina xwe helbijart, perçak deh firinkên Ferensî xist qelşa peran û destikek kişand û

pakêta xwe girt. Lê bi derketina pakêtê re dengê deh firinkên wî jî hat û wî nas kir ku mekîna şaş e û perên wî bi şaşîti lê vegeand. Bêhtengiya Xisro yê ku xwe bextreş û perîşan didit hinekî şikest û bi lez, carek din deh firink rada qula ji bona peran û destikê pekêtan ve carê kişand. Xuşînî ji nava mekîna hat û kulmek pere hate xwar. Xisro zû pere berdan nava çentê destan û bi tirs li dora xwe nêri. Kesek nebû û wî cardî pere avêtin qelşa mekîna û cardî jî xuşînî ji nava mekîna hat û pere ji qula jêr herikin û li piştî camê kom bûn. Xisro bi lez û bez, bi heyecan cama biçûk bilind kir û pere dan hev.

Cî di çentê piçûk de nema kaxez, defter û pirtûkên xwe derxistin, xistin kêsekî naylon û cî ji bona perçên deh deh, pênc, pênc re çêkir. Dema perên ku wî dixistin qelşê û tede asê diman, bi çend kulmên destê xwe, bê ku ew pîrr deng ji mekîna derxîne, dihişt ku cardî jî bibe xuşîna peran û perçên deh firinkên zer û yên pênc firinkên zivînê mîna libên terezê, di korta pişt camê de kom bibin. Çentê destan mişt bûbû, berikên çakêt û şelwer di bin giranbûna peran de biçirîyan. Xisro di dilê xwe de dixwest ku mekîna perên kaxez bidanayê, lê xuşîna ku ji wan perên hesinî dihat pîrr bi wî xweş bû.

Ji nişkê ve, mekîna nema pere dan Xisro, piştî ku bi tirs li dora xwe nêri rahişt çentê xwe û ji wê dera han dût ket. Istgeha tirênan herdam vala bû û lampên, wek stêrikan, di esmanê istgahê de meriv kor dikirin. Xisro li seeta diwarî nêri û terpinî ji nav wî hat. Wî lêva xwe ya jêrî gez kir. Tirên çûbû, ji ser zikê istgahê rabûbû. Şivên rîyên hesinî, di nava durbûnê de diçikîyan, wînda dibûn. Çavên Xisro li tirênê reş û dirêj, di ciyekî dût, di istgeha vala de, ketin û wî ji xwe pirsî: Ki dizane, belkî ev tirên jî min bigihîne daxwaziya min?

Wî li dora xwe nêri û xwest ku çav wî li karkîrekî istgehê keve ta ku ew çend pirsan ji wî bike, çend pirsan li ser tevgera tirênan, lê istgah, bêdeng bû, bê çûn û hatin bû, bê carecara rêwiyan bû, bê qirînên rojname firoşan bû. Xisro berê xwe da ew tirêna mayî û bi gavên sist, di bin barê giran de dem nêzik bû. Ji nişkê ve, dengê qalind li pişt wî ziravê wî qetand û di sînga wî de bû qurpe-qurpa dilê wî. Wek dengê bavê wî bû.

- Tu bi ku derê de diçî?

Xisro di ciyê xwe de bû wek kevîrekî û mêrikêk nêzikî wî bû. Polis bû? Berpirsiyereki istgehê bû? Rêwiyekî wek wî ji tirêna xwe mabû? Xisro ruyê mêrik nedidit û nikaribû bigotaya ew çend salî bû. Qurpe-qurpa paniyên solên giran bilindtir bû û xwe li wî girt.

- Min û Yaşar, me bilêt kirin û me xwest ku em herin Kurdistanê, lê ez dereng gihastim istgahê. Yaşar nuha pîrr dût ketiye û gerek min pîrr guh li wî kirîbiya. Ax! Ma ew tirêna han dihere ku derê?

Mêrik li çentê Xisro dinêri û ji perda dengê wî dixuya ku di temenê xwe de, wî gelek pirs kiribûn û pirsên wî gelekî bê bersiv nemabûn.

- Çi di çentê te de heye? Û çima bêrikên te wilo dagirtî ne? Xwedanek sar bi canê Xisro de herikî û devê wî ket hev. Wî xwest bireve, lê çimên wî di bin laşê wî de dilerzîn. Wek ku mêrik bi tiştên nava Xisro bîzanibe, xwe nêziktir kir û destê xwe avêt destikê çente û ew ji nav tiliyên Xisro derxist. Deng ji Xisro nedihat, zimanê wî di devê wî de bûbû wek perçak text. Hemû rê li ber wî hatibûn girtin.

Mirovê istgehê, devê çente vekir û pîrqînî bi wî qet. Tiqetiqa kenê wî bêdengiya istgahê dirrand. Dema ew tîra xwe kenîya, wî li ruyê zerbûyî yê Xisro nêri û devê çente ber bi jêr ve kir. Ji hundirê çente qumek hûr herikî, rijîya. Qum rijîya, wek ku av ji

devê kûz yan ji devê meşkê biherike û bayekî ne pîrr xurt ew qum di valayîya istgehê de belav kir.

Bi derketina qumê, tirsê ji xwe ji nav Xisro kişand. Tirsa Xisro şikest û ew poşman bû ji ber ku wî kaxez, defer û pirtûkên xwe ji bona komkirina qumê wînda kiribûn. Dema wî destê xwe rada berikên xwe, tiliyên wî ketin nav qumê. Wî bi sistî bêrikên xwe vala kirin û quma hûr ji wan jî hate xwar. Xisro nema dizanibû ku wî çî dixwest, hema destê xwe ber bi tirêna pîrr dirêj ve kir:

- Ma gelo ez dikarim bi wê tirêna han herim Kurdistanê?

Ew mêrikê ku ruyê wî xweş nedihat xuya kirin, zû bi zû, bersîva Xisro neda û wexteke dirêj li tirênê nêri, berî ku ew bi dengêkî nizim bibêje

- Xisro rebeno, ew tirêna han tirêna mirinê ye. Ma çima te wek Yaşar nekir û anha jî tu ji tirêna xwe mayî?

Wî mirovî carek din ji li tirêna reş û pîrr dirêj mêze kir û ji Xisro re got bîyî ku ew ruyê xwe ber bi wî ve bike. Wî dixwest, bê guman, bersîva pirsê wî bidaya:

- Na! anha tu nikarî li ve tirênê siwar bibi. Hîn roja çûna te nehatiye.

Li ser van gotinan Xisro ji nav ciyê xwe çenk bû. Dema wî çavên xwe vekir, wî xwe di nav xwedanek mezeloqî de dît. Zengilê seetê li ser masa ber serê wî lêdixist. Seet neh bû û Xisro rabû ser xwe. Wî pencere vekir û bayekî sar derbasî hundirê odê bû û çend tevzînokên sar di canê wî de çikandin. Yaşar, hevalê wî yê pîrr hêja hat bîra wî, û ruyê wî yê bi bedew, li piştî cama tirênê, hat ber çavên wî. Di pencerê re, çavên Xisro li darên rût ketin. Wî bi lez ser çavê xwe şûst û di pelikan de daket û berê xwe da mêtro, tirêna binê zemîn. Ew dê biçûya karê xwe, lê gotinên wî merovê ku li istgahê rastî wî hatibû nedixwestin ji ber guhên wî wînda bibin.

Joe O'Sullivan:

"Kurd Îrlandiyên Rojhilata Navîn in"

Destpêk: r. 6

Divêt were gotin, ku tevî biçûkbûna heza leşgerên Kurd, wan roleke mezin lîstin, bi taybetî di parastina rêçikên zexîra ku diçû Rûsan re.

Pirs: Gelo arşîva van kesa li Înglîzîtanê heye, heger yek bixwaze lêkolînekê di derhekê wan de çêke..?

Joe O'Sullivan: Bawer im, erê. Bawer im navê vê ofîsê Government Records Office e, li London e. Merovê bikaribe di bin navê koman de (Unites) li endamên wan bigere.

Pirs: Em qebûl bikin, ku ji hezar Kurdî bêtir ji Înglîzîtan re leşkerî kirine, hejmareke ji wan di komeke paraşûtçiyên Çiyana de bûne. "Wilayeta Mûsilê" ji bi rîya Înglîzîtanê bûye beşekî Iraqê, şûna ku îro beşê Kurdistanê Iraqê ye, bi baweriya te, gelo Brîtanî ta radeyekê ne berpirsiyarên van bûyerên tîn serê Kurdistan e? Gelo ji bo Înglîzîtanê ne pêwîstiyek e, ku ew, bi kêmasî ji bo misogerkirina jiyanê azad ji Kurdistan re tiştêkî bike?

Joe O'Sullivan: Bi baweriya min, ev wacibekî moraliye ji bo Brîtanîya ku ew li leşgerên ku ji bo wan şer kirine binihêrin. Ev yek. Ya duyem, wacibekî moraliyê di derheqê neteweyê Kurd jî heye. Wek hemû împaratoriyan, Brîtanîyan jî ji bo bikaribin karbidestîya xwe bidomînin tiştine kirin. Ez tevahî nizanîm, ka Kurdistanê Iraqê çawa bû beşekî ji Iraqê. Wi-

layeta Mûsilê beşekî ji împaratoriya Osmanî bû. Bi baweriya min, ihtîmalê mezin ew e ku ev hemû bi rêzeye pêwîstî çêbû, wek gelek tiştên din. Bi baweriya min, Brîtanîyan mumkûn e ku xwestibin hukûmeteke dost a bi hêz li şûna xwe, li Iraqê binihêrin. Ji xwe jî bîr meke, Qiral berdevkê wan bû. Wan xwest petrola Kurdistan di bin kontrola hevalên wan yê Iraqê de be, ne di bin kontrola komeke ku baş nedihat nasîn, gelê Kurd. Ez bawer im berpirsiyariya Brîtanîyan heye. Min di derheqê vê yekê de ji "London Times" re nivîsand, ku pêwîst e Brîtanî dest pê bikin li çareyekê ji bo helkirina Kurdî li Rojhilata Navîn bigerin, ji ber ku Brîtanîyan ew bi kar anîn, di dema ku Brîtanî di tehlûkeyê de bûn Kurdistanê alîkariya wan kir, Iraqî li dij wan bûn.

Pirs: We demek tev Kurdistan derbas kir û tev jina xwe hûn li Kurdistanê jî mane. Gelo bîrûbaweriya we li ser karakterê Kurdistan çiyê, çi tiştên wan bala we kişand ser xwe?

Joe O'Sullivan: Berî her tiştî, wek merovên leşger, Kurd pîrr bi heyecan bûn. Me tim digot, emê bi Kurdistanê êrîş bikin, bila Asûrî jî bi rola manawerê rabin, ji ber ku Asûrî xwedî karakterên cûda bûn. Kurd bi heybet bûn û gelekî dilsoz bûn. Cara yekem, min xwe tev leşgerên Kurd bi paraşûtê ji balafirê avêt xwar. Wek tradîsyon, serleşger, berê leşgeran dişîne jêr, lê Kurdistan ez berî xwe jî balafirê avêtim jêr. Li dû min 25 Kurd hatin. Wan got, heger tu berê nerî, em nayên.

Merovên pîrr dilsoz bûn. Carekê bi şev di şer de bûn. Ez û hogirekî xwe berpirsiyarên vî karî bûn. Hogirê min û komeke ji Kurdistanê êrîş kirin û xwe gîhandin deriyekî. Êvar bû, me didî guliyên ku li şîşên dêrî diketin çawa dibirûsin. Serleşgerê Kurd û hogirê min, Desmond Reid, bi deriyê hesinî de hilperkirin. Û xwe avêtin hundur. Koma Kurdistanê yek û du li dû wan çûn. Bi rastî, hê îroj ez nizanîm ew çawa nehatin kuştin, ji ber ku gulle di navbera lingên wan re derbas dibûn. Merovên hewqas cesûr bûn! Ji ber ku ez Îrlandî me, ez tim dibêjim, Kurd Îrlandiyên Rojhilata Navîn in. Ew, siyaseta li holê napejîrînin, dixwazin li mafên xwe xwedî derkevin. Kurd li ku bûna jî, li bejn û kincên xwe dinihêrin. Li Barî, li Îtalya, dema ew êvarê derdiketin, merov hizmekar bû ku li wan binihêre. Bi kumên leşkerî yê sor, xencerên zîvîn li pişt wan û bi kincên paraşûtçiyên hev re dimeşîyan. Dema me ew li bajêr didîtin serê me bi wan bilind dibû.

Li Kurdistanê tiştê bala me kişand ew bû, ku jinên Kurdistanê rûyên xwe venedîştin, bê hêram bûn. Em bi dilşadî di nav Kurdistanê diman. Jina min du caran bi min re hat. Geh di konan de tev jinên Kurd dima, geh jî êvarên havînê tev wan li ser textan radiket. Keça me ya mezin, ya ku nuha li Sydney dijî li Kurdistanê bi ser lingan ket. Ji ber ku erd hewqasî zivir bû berî ku bi çarpiyan here dest bi meşê kir.

Pirs: Birêz O'Sullivan ji

Li ser çiyayê Agriyê heywanên xeşok...

Destpêk: r. 12

Marê teyar

Wisa xuya ye ku li vê herêmê marê herî dirêj marê teya ye û dirêjahiya wê nêzî 2 m. an jî zêdetir e. Rengê marê teya qehwengiyê tarî ye û li ser xalên piçûk hene. Binikê wê spî ye. Li vir ez dixwazim qala serpêhatiyê xwe bikim.

Piştî ku em çend seet li pey maran geriyam, em hatin newaleke ji lav pêkhatî. Dema rûniştin çend mêtro ji me bilind li ser zinaran hin însanên bi meraq xuya kirin. Hin Kurdên vê herêmê em dîtibûn. Dema min destê xwe avête kamera xwe ku resmê wan bikşînim, ji zinaran marê teyar serê xwe derxist û dema însanan dît paşde kişand. Ev marê teyar li gor qalindiya xwe ya laşê pêş nêzî du mêtro hebû.

Me ji marê teyar yeke din jî dît. Xwarina wan çûk û mişk in. Li rohilata Tirkiyê(Kurdistanê Bakur) û li herêmên derûdora wê hene.

Marê mirdarok, koremar

Vaye marê mirdarok li wê derê dirêjkirî ye. Di bin taverojê de difikîne. Dema min dibîne berê xwe dide zinaran. Bi hewesa ku ez vî marî bigrim, min destê xwe avête piştê wî. Marê mirdarok hema bi derbekê devê xwe avête destê min û pê veda. Diranekî wî yê jehr jî lepikê min derbas bû. Min ew berda, lepika xwe derxist. Min dît ku dilopek jehr li ser navtilfîya min e. Ez pîrr tirsîyam. Şansê min hebû ku diranê marê mirdarok negihîştîye min. Perfilev

P. P. (Pharmacology and Toxicology -Moskova 1941) qaldike ku sê kesên ku ji alî marê mirdarok hatine vedan û ji ber tesîra jehra wî mirine. Wek adetî girtina marê mirdarok ne dijwar e. Min pîrr bi rehetî di nav zinarên bi lav marê mirdarok girtine. Gelek caran mirov hebûna wan ji fikandina wan dizane.

Di dema lêgerîna marê mirdarok de bûyereke ecêb çêbû; ji gundekî piçûk ê Kurdistanê gelek însan bi bazdan ber bi min û hevalê min Mats Höggren hatin. Di nav van însanan de jinek hebû û wan îddîa dikir ku marê mirdarokê pê vedaye. Li ser çavê jinekê du "îşaretên pêvedanê" şanî me dan. Lê me ji vê yekê bawer nekir. Halê jinekê ne baş bû lê ku marê mirdarokê pê vedabûna nedikaribû di ciyê xwe de rawesta. Piştî bîstekê me dît ku tu talûke tune. Çend deqîqeyên din xortek di destê wî de marekî mirdarokî mirî hate ba me!

Marê mirdarok nêzî mêtroyekê dirêj dibin. Yê herî dirêjûrîna ku me li çiyayê Agirî girt, nêzî 90 cm. bû. Rengê marê mirdarok zerê vekirî û belekên reş û porteqalî li piştê wî hene. Xwarina ku pîrr jê hez dike(gnagare) e. Ji marên ku me di vê nivîsê de jimartin tenê marê mirdarokê dizê. Me li çiyayê Agirî jî behrê 1700 m. bilind, marekî mirdarokê dît.

Marên mirdarok li Rojhilata Tirkiyê(Kurdistanê), Ermenîstana Sovyetê û Rojavaya Bakur a

Îranê, hene.

Marê avî

Gelek herpetolog marê avî dişibînin marê avî yê li Ewropa, lê bi baweriya min marê avî yê li çiyayê Agirî marekî taybetî ye. Ez li benda rapora lêkolîna li ser marê avî me. Ev marê avî zaftir dişibe tewreke marê avî li DYA. Serê wan dirêj û tenik e. Rengê herdu aliyê serê marê avî porteqalî ye. Dirêjahiya marê avî di navbera 60 cm-80 cm de ye. Gelo xwarina vî marî çiyê? li vê bilindiya çiyayê Agirî avên ku tim û tim diherikin ku masî tê de hene, tunene. Îhtîmalek mezin e ku marê avî beq û giyayên avî li avên nêzî Ixdîrê dixwe. Dibe ku beqê bejî xwarina wî be?

Di nivîsa Mikael Nordström de ji bil van marên jorîn çar marên din jî hene. Me navên wan derneixist. Navê wan bi latînî Elaphe quatuorlineata sauromates(nezî 120 cm dirêj dibin), Elaphe hohe-nackeri û Coluber ravergieri ye.

Mikael Nordström herpetologekî amator e.

Niha li ser parastina tebîeta Tirkiyê mijûl dibe.

Ev nivîs ji kovara Swêdî ya "Fauna och Flora" hejmar 1-1990 çap bûye û ji alî H. Berçem hatiye wergerandin.

Hindik-Rindik

Sonda xwe bi cî anî

Yekî Erebe lokê-devê nêr- xwe wenda kiribû. Devê wî bi kêmasî hezar qurîş dikir. Ji xwe re sond xwar, got:

- Heger ez bibinim, ezê wî bibim mazatê û bi quruşekî bifroşim.

Pîrr derbas nebû devê xwe dit. Ji bo ku sonda xwe bi cî bine rabû pisîkek guhkurmî girt, kir torbakî û torbe jî bi hustiyê lok ve kir û lok bîr mazatê. Li mazatê bi dengê bilind bang kir, got:

- Lok bi quruşekî, pisîk bi 999 qurîşî! Her du bi hev re bi hezar quruşî.

Cambazên mazatê lê kom bûn, di nav xwe de bû ku repîsta wan, gotin:

- Welêh lokî erzan e... ne ev bexwedîya pisîka guhkurmî buya.

Sûretê bizina wî tê ber çava

Nabîyê şair ê Ruhayî avêtibûn hefsê. Di huc ra Nabî de gundiyeke jî hebû. Nabî li ser halê xwe, li ser jiyana hefsê her roj şîr dinivîsand û şîrîn xwe jî mêrike re, jî hevalê xwe yê hucre re dixwend. Her cara ku Nabî şîr dixwend, yê gundi jî li ber, kûrr-kûrr digriya. Nabî rojekê meraq kir, got:

- Bira, her cara ku ez ji te re şîrê dixwinim tu xwe ranagrî û digrî. Ma qey şîrê min pîrr bi tesîr in?

Mêrikê gundi bala xwe da rîya Nabî ya têt-têlî û got:

- Begefendî, griyê min ne ji ber wê yekê ye. Li gund bizînek min hebû, rîya wê jî eynî wek a te bû. her cara ku tu şîra diwxînî sûretê bizina min dema kayîka xwe dike tê ber çavê min; lema ji dilê min xera dibe û ez digrim.

Amadekar: Z. Xamo

bo vê hevpeyvîne ji we re zor sipas dikim. Guman tê de tune, hûn dostekî gelê Kurd in. Ez bi vê axaftina bi we re bextiyar û serbilind im.

Joe O'Sullivan: Ez jî pîrr sipas dikim. Tu dizanî ez çiqasî

bextiyar û serbilind dibim, dema ji destê min tê ku ez tiştêkî, çiqas piçûk be jî, ji bo Kurdistanê dikim. Ez bi şeweyê şexsî deyndarê Kurda me. Ez bawer im Welatên Hevalbend jî deyndarê Kurdistanê.

Swêd

Raxistin

Li Kitêbxana Borlengê(bajarê Dalarna) di navbera rojên 8 û 22'ê Heziranê de raxistînek li ser Kurdistan hat vekirin. Rojnamên herêma Borlengê di rûpelên xwe de cîyekî firêh dan raxistinê.

Komîte

Li bajarê Uppsalayê di 14'ê Gulanê de Komîta Swêdî ji bo Piştigriya Mafê Mirovî ya Kurdistan hat damezrandin. Komîte ji 6 partiyên Swêdê yê ku di parlamentoya Swêdê de parlamenterên wan hene, pêk tê.

Li Bajarê Uppsalayê nêzî 2000 Kurdî dijîn û Komela wan bi 800 endamên xwe di nav komelên biyanîyan de komela herî mezintir e.

Radyoya Kurdî li Spånga

Rojên Şemiyê seet 18⁰⁰ -18³⁰ de li ser pêla FM 91,1 MHZ ji bo navça Stockholm Jerva weşan dike.

Rojên Duşemê jî di navbera 13³⁰ -14⁰⁰ de li ser pêla MHZ ji bo navça Stockholm City dubara dike.

Navnîşan:

Box: 4118

163 04 SPÅNGA/SWEDEN

Tel: 761 51 22

GİBİKULA⁽¹⁾

Arêkerdox: Malmîsanîj

Wanî (2) zemanê yew mêrdim bî, yew maya cê bî, yew zî manga cinî bî. Xwî rî a manga reydi îdare kerdîni.

Namê mêrdekî şarî pa na bî Gibikula (Gukula). Ti ra watîn Gibikula. Ha Gibikula, ha Gibikula... Ey lacik pîl bî, henî xwî şinasna, bî carmed, xwîy kerd, wa (3):

-Dayê, ma se kî? Eno "Gibikula" ma ser ra nêwîdarêno, ma ro kerdo leqami. Ma newtanî vecî teber. Eno gerek se bo?

Maya cê wa: -Lacê mi, de ti zanî, yew hewa biki ki maşale ino name to ser ra hewa niyo. Ti zî wila pîl û tamam î, şar ki to ra wano Gibikula, ez to ra ewnêna, şermayena.

Mêrdekî wa: -Yew manga ma esta, ti bala mi dana se biya ma a zî sere birnî, dewican da'wet kî, zera gedan-medanê cinî weş kî, wa mi ra nêwacî Gibikula.

Wa: -Ey ti zanî, wazenî biya ma sere birnî.

Manga xwî ardi sere birnay. Veynda dewican û mahleyican da. Gede û cenî amê pê ser, key-kelebût goştê xwî werd. Wexto ki veciyay teber, vila bîy, di tenan fektê berî di wa:

-Ha ha, le la Gibikulay se kerd!

Veng şî mêrdekî, mêrdekî wa:

-De şîma ko weynî! Yew manga mi bî, mi a zî şîma rî sere birnay goya ki şîma enî (inî) namî mi ser ra widarî. Şîma zî hima berdê mi ver d' î, şîma wanî Gibikula. Rind bizanî, ez ina şîma rî nêverdena. Kamik roc bibo ez gere enî heyfî şîma ra bigîra. De şîma ko weynî!

Rocê mêrdek werişt, ay postê mangada xwî pêro kerd heze panc qurîşî, des qurîşî, mecîdey û dekerdî heqîbe, herdê xwî wenay, vera xwî day Sûki (Diyarbakir).

Ma wacî şî Şelbetî (4) eki yew karwanî ewra ronawo. Qutîyanê karwanî di malo pank, topê qumaşî û çîyo ercaye esto. Mêrdek şî aw daşt, hemîni ra daşt barê xwî rona. Inî wa:

-Liya ti çî yî, çî kare yî? Bê ewta roni, ma xwî rî biteriqnî.

Wa: -Nê baw, nê, ez nîna şîma het.

Karwanbaşî tadiya wa ki:

-Eno mêrdim kura esto malê cê maldê ma 'entîkeyêr o. Muheqqeq malê cê zav rind o coka nîno ma hetî, ma ra dûrî şono. De şîma xwî finî bende ki ma ay barî emşo ti ra bitirawî.

Ê zî xwî rona, xwî derêna, 'eba anti qoqda xwî, xwî pîze di wa "qe nîni barê mi nêbenî ê xwî ca di nêverdanî."

Mêrdekî pawit, pawit, di tenî amê, heqîbe cê berd vist qantîra xwî ser, yewna bar ard herinda bardê cê di rona û karwanî da pîro şî. Mêrdek werişt, hêdikî herê xwî ant ver, bar vist

ser, vera herî day kiye. De malê tucarî yo, pêro topê qumaş î, filan î bêvan î.

Ame kiye kermer (kermel) vist pê ser. Dewicî amê, wa:

-La eno çî yo, çî beno? To se kerd? Eno mal endî to kura ra ard? To xizna dî, se kerd?

Mêrdekî wa: -Wila şîma xirabê mi kerda feqet ez ko şîma rî hewli bika. A manga xwîna ki mi sere birnaybî, mi postê ca pêro kerd heze panc qurîşî, des qurîşî û mecîdê ew mi berdî Sûki. Hema bewnî, ser o pê ro daynî. Mi day, mi eno mal pêro gurot ew mi wena ez ama.

Dewican wa: -Enka ti raşt a wani?

Wa: -Aha nanîk o raşte di.

Dewicî hema vazday, awo ki yew manga cê bî, awo ki yew gay cê bî, awo ki yew vîştîray cê bî, pêro sere birnay, postey cê kerdî heze panc qurîşî, des qurîşî û mecîdê. Ew wenay dewarî, vera cê day Sûki.

Şî Sûki, şarê Sûki wa: -Eno çî yo şîma wenawo?

Wa: -Post o post!

Wa: -Postê çî ye? Hele derxin em mêze kin, ji çaroxan ra dibe, solan ra dibe, çî ra dibe? (Postê çî yo? Hele vejê ma biewnîrê, çaroxan rê beno, solan rê beno, çî rî beno?)

Vetî ki pêro heze panc qurîşî, des qurîşî û mecîdê.

Wa: -Heyran eno çî yo? Post enawa nêroşêno. Eno çî aqil o? Eno aqil kamî dawo şîma? Şîma korî nî, şîma postê dewarî giroto ena kerdo. Ne ça-roxî beno, ne solî beno, ne yewî gêno. Eno kamî şîma ra wato?

Dewicî vindertî yewnan ra ewniyay, wa:

-Wey Gibikula wey? To wa "ez şîma rî nêverdana", ma nêzana. To key ma veşna. Ma dewarê xwî pêro sere birna. Poste zî yew nêgêno.

Dim a wa: -De bancinî ma cê kiye di tebşî, bikşî. Ê ma wû cê kiştîş o. Ne ga, ne golik, ne manga, çiyekî ma ra nêverda. Ma pêro sere birnay, ma wa qay raşt a.

Ey ê fam kerd. Qiflê cinî ki dûrî ra vera dewi veciyay, ê maya xwî tembê kerdî, wa:

-Bewnî, eki mi persay, ti cay mi nêwaca ha! Bidî xwî ro, glîjê xwî bancî, wacî "lacê mi merdo". Ez şona mezeli miyan di xwî dekena bindê tirbi, hermera teza finena xwî ser, yew quliki te de verdana. Belkî inan nêkî, çimkî qesba cinî veşena. Eki wa "eki lacê to merdo tirba cê ma nawnî", wa zûrî nêbo, bê tirba mi cinî nawnî.

Û şî xwî limit (nimit). Dewicî amê dekewtî dewi miyan, eno pol gêray (geyray), aw pol gêray, amê marda cê ra persay, wa:

-Gibikula kura wo? Gurey ma pê esto.

Maya cê da xwî ro, bermay,

wa: -Lacê mi merdo!

Dewican wa: -Ti zûrî kena. Eki ti zûrî nêkena, tirba cê kura ya?

Wa: -Heydî, ma şêrî mezeli, ez tirba cê şîma nawnâ.

Şî, bide nawit ki ha! Wila raşt a, tirba cê teza ya.

Dewican wa: -Eno namûsiz xwî ra merd şî, balê bêrî ma gî xwî dekê mezeldê cê. Pêro amê tirba cê ser o giy xwî kerd û wa:

-De şo, ena besê to ya!

Dim a tadiyay amê kiye.

O warişt aw gî cinî û zibil û zebali dekerdî di hebî qutîyan, herê xwî ant ver, qutî wenay, vera xwî day Sûki.

Rana ma wacî şî Şelbetî eki karwanî barê xwî visto. Ê barê xwî berd aw daşt di rona. Karwanî weyn da, wa:

-Liya, bê ewta. Ti qey şî to ewra tek ronawo? Bê ma hetî roni, ma biteriqnî.

Wa: -Nê baw, nê, ez nîna şîma hetî. Ayo mendo şîma cay malê min û malê xwî bibedilnî. Malê mi pank o.

Karwanbaşî embazandê xwî rawa:

-Temam, malê enî namûsîzî 'entîke yew mal o. De şîma xwî finî bende, maşale buso ki ma malê cê bedilnê.

Karwanî xwî vist bende.

Ê zî 'eba anta qoqda xwî, bin ra ewnêno, wano "qe nîni raşt a nêbenî".

Nêmey şewî, di tenî xwî bide resnenî. Hema wirdî ciwalan xwî miyan ra kenî, benî wenanî qantîrî, barê qantîrî zî anî mêrdekî hetî ca di verdanî û ray kwenî.

Karwan ki şono, mêrdek zî barê xwî wenano, vera xwî dano dewa xwî, tepa ageyreno.

Dewicî ewniyay ki mêrdek amewo, rana tewir tewir mal xwî di ardo. Dewican wa:

-Le eno Gibikula merd, ma şî giy xwî zî tirba cê ser o kerd. Enka eno mal pêro kura ra ardo?

Yewî wa: -Hela bancî, ma cê ifade kî weynî!

Şî weyn da, mêrdek ame raşte, wa:

-Şîma wani çî?

Wa: -Ma wani çî? Ti mal kura ra anî? Ti qey ma rî zî nêwanî ti se kenî?

Mêrdekî wa: -Mi a ray şîma rî wa. Şîma şî, şarî şîma xapênay. Postê dewarî tay pere kerdê la? B'ewnî aw giyo ki şîma tirba mi ser o kerd, mi aw gi û tay zibl û zebali dekerdî qutîyan berdî day, eno mal gurot û ez ama. De hinî nêzana, gubrî rî genê, xiyaran û firingan rî genî, çî rî genî. Mişterî ser o yewnan kişeno. Nêverda ez barî herî ser ra rona, mi da eno malo temiz gurot ard. De ez hinî şîma rî waca çî?

Dewican a gamî ra pey henî giy xwî teber ra nêkerd. Hemîni axuran di kerd, top kerd, pêser kerd. Heta rêxa heywanandê xwî, kutikandê xwî zî arê kerdî, dekerdî miyan.

Rocê hemîni xeberî day yewnan, wa "barî tamam î?", wa "temam î". Barê xwî dekerdî, wa "ma meştî wenê".

Roco bîn des-pancê barê ziblî û giy wenay, tê rey kewtî. Şî heta Pirdo Siya (5), yew variti

ver de da, yew variti ver de da, ay zibl û zebali pêro hîy bî, ciwalan ro elawiyay. Inî zî xwî to kerdo, ramenî.

Ramit, şî Sûki. Kuçan di çarnenî. Bûyda rêx û giy di ti nêewtanî şêrî nîzdî heran.

Şarê Sûki wa: -Eno çî yo şîma ardo le la? Ena çî bûy a?

Wa: -Gi wo, gî!

Şarî wa: -Law gû bi rû!

Namûsiz! We ew tişt bar kiriye aniye, bin-buxar ketiye van deran! Va çî ye, çî mesele ye? Hûn dibin kê rê? (La gi bi rî! Namûsîzîni, şîma no çî bar kerdo ardo, bûy-buxarî kewta enî cayan! Na çî ya, çî mesela ya? Şîma benî ku ra?)

Wa: -Jî me ra gotin bajêr da pere dike! (Ma ra va şaristan di pere kenî!)

Wa: -Law, de bigrin zû derkevin, heta pulis-mulisan hûn nedîne! Ew dê we bigrin, we ceza bikin. We bîhn avêtiye nav bajarê! (Law, de bigirî lezi vejîyê, heta pulis-mulisan şîma nêdiyê! Ê do şîma bigîrê, şîma ceza kerê! Şîma bûy vista miyanê şaristanî!)

Ew ay ciwalî, ay herî, ay re-sney ano tê di ca di verday. Henî rana yewnan dest di suwendê dîn û imanî û telaqî werd eki "ena ray ma 'esla gerek cê bikşî".

Tê rey kewtî. Cilê heran pêro berbat bîbî. Zavini herê xwî ca di verday, wa:

-Ma ena bûy-buxarî xwî di nêbenî kiye. Ma gere Gibikulay bikşî!

Amey dewa xwî. Qifley cinî ki aw lewe ra veciya, "Gibikula" perra. De ne o paweno, zano.

Wexto ki perra, inê (inî) amê. Inê amê dewi resay, eno pol Gibikula, aw pol Gibikula, kewtî dewi miyan, wa:

-Naşt-daşt a tahqatê ci virazî, weynî kura şîyo; ma rî tepşî, biyarî.

Yewerî va: -Eno poldê dewi di veciya hetê roy ra şî.

Vîst-hîris tenî sere bi ser na, ha eno pol ha aw pol; mêrdekê to diyar kewtî ki yew şîwane (şuwane) nanîk o ew ra, kulaf anto xwî ew pesî ver di lûlî cineno, gurr-gurra lûlî ya.

Şîwanî wa: -Ti qey vazdanî liya, liya? Kamî pey ra to dimi nawo, çî qewmîyawo?

Wa: -Le le ez çî nêvazda? Dewi di yew muxtarê ma esto, belayê xwî mi sawito. Keyna ci rind a, wila ez nêwana rindi niya. May û waya mi bo, zav rind a; mi ra wano "illehî gere ti bêrî bigîrî". Ê ez nêgêna bebem, cenîya mi esta, mi rî zewac lazim niyo. Mi dim a kewtî, vîst-hîris tenî nanî mi dim a vazdanî ki mi tebşî, berî keyna muxtarî mi ro mare kî. Bebem ez nêgêna keyna cê!

Şîwanî wa qay raşt a. Wa: -Liya la yew çîyo enasarên wa mi dest bikewtîni, cenîya mi çîna.

Mêrdekî wa: -Liya cenîya to çîniya, hima kulafê xwî bidî mi, çîwa xwî bidî mi ew ay cilanê xwî bidî mi, cilanê mi pîra gî (gîrî); gamî ca vazdî, ko to dim a kwî, wacî "ha nanîk o, ha nanîk o!", vindi. Wexto ki to tebîşê, to benî keyna muxtarî danî to. Wa keyneki to rî bo, mi rî lazim niya. Be'dî zî wazenî bê xwî rî pesê xwî, kulavê xwî nû çîwa xwî bigîrî, şo. Ez enê gurî qaydê Ellay rî to rî virazena.

Şîwanî hema kulafê xwî, çîwa xwî, lûliya xwî day cê; çîy-mîy xwî cê pay day; ê cê pîra gurot, çîrpo perra.

Dewicî dim a kewtî, wa:

-Nanîk o, ha nanîk o! Vera medî!

Şîwane vazda. Gamî ca vazda, vazda, dewican wa:

-Hero, la ti kura şonî? To key ma xeripna! To ne dewar ma ra verda ne pes ma ra verda ne çî ma ra verda. Henî veradayîşê to esto?

Şî, senê ki bide resay, şîwane tebîşt, da pîro kişt. Hesabdê cin ra ki Gibikula kişt.

Aw roc nê, roco bîn, ewniyay ki yew şîwane nanîk o yew coldê pesî ver kewto, tubrr-tubrra cê ya, hella-hella cê ya, be'r-be'ra cin a, yenî. Wa eno kam o, kam niyo?

Yewerî wa: -Eno Gibikula wo!

Wa: -Liya Gibikula ma kişt!

Wa: -Nê wila, eno Gibikula wo.

Wa: -Ekse o yo, vazdî, biyarî ifade!

Şî tebîşt, ard ki raşt a yo.

Wa: -Liya Gibikula, eno çî pîlan o ti ma ro virazenî? Aqildê ma ma ti kiştî.

Wa: -E şîma ez kişt a. Şîma ez kişt a vista kura?

Dewican wa: -Ma ti kiştî, vîstî yew goli.

Wa: -Ez raştî waca, wexto ki şîma ez vista goli, ez kewta goli ki pes te d' o. De ti ko xwî rî wacî mêşnê te d' ê, de ti ko xwî rî wacî heywanî te d' ê. Eno di rocî yo ez xebtêna, mi zor enî vetî. Eno col mi xwî rî a goli miyan ra vet ard. De ez rayîr şîma nawnena, şîma goli diya, henî şîma kam carmed î, xwî rî şêrî.

Mêrdekî ki ena wa, dewi di ne gede mend ne gûde mend, ne cenî mendi ne carmed mend. Pêro wa:

-Ma şêrî goli pes te d' o!

Dormare goli ro gurot. De qorî esnawî nêzanî, qorî zanî. Ayê ki nêzanî, verî xwî da aw ro ki şêrî mêşney biyarî. Ayê ki zanî, xwî tepa da, wa "hela ma weynî".

Ayê ki esnawî nêzanî, senê ki şî aw miyan, ti ro şîveciyay, bêhemdê xwî destê xwî weşanay.

Ayê ki teber ra vinderdî, wani: -Bewnî, ma ra wani "berî, ha bêrî"!

Hema çerqîrnî ra xwî pa nanî.

Dewicî tê di gol di xeniqênî, ya di tenî ti ra xelisênî ya nêxelisênî. Top goli di manenî. Dewi Gibikulay rî manena.

1 Na mesela heway vatîşê yew mêrdekê Gêlijî nusiyay (Gêl, yew qezayê Diyarbakir o).

2 wani: wani, vanê, vonî, vûnî

3 wa: va

4 Şelbetî (Şelbetîn): Namey, yew dewa qezayê Gêlî yo. Dewleta Tirkîye nameyê na dewi kerdo Kalkan.

5 Pirdo Siya: Nameyê yew pirdî yo ki beyntarê Gêl û Diyarbakir di yo.

Anons

Östersund Kommun söker hemspråkslärare i Kurmancî

Upplysningar

Tel: 063- 102476

Komûna Ostersundê li mamostayê zimanê Kurmancî digere

Bo agahdarî
Tel: 063- 102476

Ostersund bajarekê Swêd e

Perestroyka û mesela Kurd

Dr. Celilê Celil di 8'ê Tîrmehê de li Stockholmê li ser rewşa Kurdên Sovyetê di bin navê "Perestroyka û pîrsa Kurd" de semînerê çêkir. Dr. Celil axaftina xwe li ser van nuxteyan top kir:

1) Tesîra perestroykayê li cihanê û li ser mesela Kurdî 2) Tesîra perestroyka li ser Kurdên Sovyetê, 3) Tesîra perestroyka li ser Kurdên Kurdistanê. Di beşê sêyem de got ku, divê Kurd ne wek Ermenîyan û Azerîyan lê wek Almanan bi hawakî pozîtîf ji perestroyka feyde bigrin, ji bo yekîtî û hevkarîyê gava bavêjin.

Semîner ji alî Federasyona Komelên Kurdistanê ve hat organîzekirin û qelebalixek mezîn semînerê guhdarî kir.

Li dinê ev meh

■Li Komara Kirgîzîstanê ya Sovyetî di roja 4'ê Hezîranê de di navbera gelê Uzbekî û Kirgîzî de şer dest pê kir. Di vî şerî de 52 kes hatin kuştin û bi sedan jî birîndar bûn. Ev tevlihevî piştî li Uzbekîstanê jî dest pê kir û li herêmên ku lê tevlihevî hene, îdara orfî hat îlan kirin.

■Li Lîberîyayê hêzên azadîxwaz piraniya bajaran xistin bin kontrola xwe. DYA dixwaze ji bo serokkomarê niha Samuel Doe dewletek Afrîkî ku wî qebûl bike bibîne. Hêzên azadîxwaz nêzî paytextê, Monroviayê bûne.

■Serokkomarê Afrîka Başûr F W de Klerk di axaftina xwe ya parlamentoyê de beyan kir ku îdara orfî wê li herêma Natal dom bike. Li van herêman îdara orfî di dema P W Botha, di sala 1986'an de hatibû îlan kirin.

■Dijîtiya di navbera serokê Solîdarnost, Lech Wale-sa û hukûmeta Polonyayê de roj bi roj kûrtir dibe. Tê gotin ku Lech Walesa dixwaze bibe serokkomar û peymanê ku bi Partiya Yekîtiya Sosyalîst a Polonyayê re hatibû kirin îftal bike. Ji aliyê din serokwezîr Tadeviz Mozowiecki bi hevalbendên xwe re dixwaze partiyek nuh ava bike.

■Konferansa Ewlekarî ya Ewropa di 5'ê Hezîrana 1990'î de li paytexta Danîmarka li Kopenhagê dest pê kir. Di konferansê de bi taybetî li ser mafê insanî û li ser hindikayiyên (eqaliyetên) Ewropayê gotûbêj hat kirin.

■Li Çekoslovakyayê di 10'ê Hezîranê de hilbijartina parlamentoyê çêbû. Forma Hemwelatî ji denga %46, Partiya komunist %13,6 û Xiristîyan Demokrat % 11.6 girtin.

■Li Bûlgarîstanê di hilbijartina parlamentoyê de Partiya Sosyalîst a Bûlgarîstanê (Komunist) ji denga %47,9 û Yekîtiya Hêzên Demokrat ku ji 16 grûban pêk tê ji denga %35,6 girt.

■Di 14 Hezîranê de karkirên ocaxa madenê êrîş birin ser muxalefeta hukûmeta Romanyayê. Polîs û leşkeran jî piştigiriya karkiran kirin. Bi kêmasî 5 kes hatin kuştin û 300 kes jî birîndar bûn.

■Li Komara Rûsyayê partiyek nuh hat avakirin. Partiya Komunîst a Rûsyayê 65 sal berê tevî Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyetê bûbû.

■Li Îranê di şeva 21'ê Hezîranê de zelzeleyek çêbû. Li gor agahdariyan zêdeyî 50 hezar insan mirin û bi sed hezaran insan bê xanî man.

■Di 2'ê Tîrmehê de Kongra 28'em a Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyetan çêbû.

Rapora Qetlîama...

buye, ew xwedêgravî 100 mensûbên PKK'ê ku berdevkên resmî wek fail ew diyarkirin gelo li ku ne? Gelo di nav seetekê de erd qelişî ketin bin erdê?

5- Li gor agahdariyên me, herçî berê hêza leşkerî û 19 "koruyucu" hebûne jî demek kurt berî buyerê vekişîna leşker ji gund û şeva buyerê mayîna bes çar korucuyan ji 19'an, nuxteyek gelek tarî ye.

6- Gund 60-70 mal e. Bes çar mal hatine hilweşandin. Malên hilweşandî bi taybetî hatine hilbijartin. Sisê jê malên wan kesan e ku "korucu"tî qebûl nekirine. Li gor îfada gundiyan xanî bi çekê lavê(yê ku alavê davêje) hatine şewitandin. Her çî li rex xaniyekî şewitandî dibistan heye ku berê wek qereqol dihat bikaranîn û şeva buyere vala bû, heyeta me tespît kir ku dest lê neha-

tiye danîn ku buyerên berê (qed jê şewitandina dibistanan ji alî PKK'ê ye N. A) li ber çav bîna girtin, rewşa wê dibistanê gelek balkêş e.

7- Aliyê gund yê ku hucûm hatiye serê, teqrîben 80 miro ji gund dîr malek tenê lê heye ku maleka mirovên korucuyan e, lê şûna tu fişekê jî li ser xanî nîne. Gelo ev tesaduf e?

Heyeta me tespît dike ku di demeke ku Konferansa Ewlekarî û Hevkarî ya Ewropa dom dikir pêkhatina bûyere wiha noxteyek tarî ya gelek girîng e ku divê li ser bê fikirin.

Em bala hemû têkoşerên demokrasî û parêzgerên mafên insanî dikşînin ser vî rastiyê ku divê qetlîama çevrimliyê bê ronîkirin ku tê xwestin tevî xwîna insanên bêgunchê be veşartin.

23 Hezîran 1990

"Divê qerarnama..."

Ew polîs û leşkerên ku xelkê sivil marûzî muamela nebaş û heqaretê dikin divê bîna ceza kirin.

Divê bê qebûl kirin ku di qereqolên polîsan de îşkence tê kirin. Û ji bo ku rê li ber vî yekê bê girtin divê hemû tedbîr bîna girtin û cezê îşkenceciyên ku ceza bûne divê zêde bibe.

Divê di mahkeman de qebûlkirina îfadeyên ku bi îşkence hatine girtin yasax bibe.

Maddeyên Qanûna Cezê ya Tirk 141, 142 û 163 û yê din ku mafên insanî didin bin nîgan, divê bîna rakirin.

- Ew dawayên ku di heqê nivîskar û weşanxanan de ji ber tiştên ku nivîsandine û belav kirine hatine vekirin, divê hew vebin û ew kesên ji ber ku dîtinên xwe yê aşîxwaz û siysî gotine hefs bûne, divê bîna berdan.

Li Diyarbekrê...


Ramazan Karaaslan, Şûkrû Kahramaner, Ramazan Kahramaner, Aziz Karakaş, Mehmet Demirel, Mehmet Dîren, Zekî Budak, Mehmet Ateş, Talîp Nusral, Seyfettin Dilekçe, Zulkuf Ozel, Metin Çilgin, Mustafa Pakdemir, Hayrettin Bozkurt, Hanefî Turan û Osman Aytar in.

Amnesty International di rapora xwe de agahdariyek fireh li ser Kurdan û kovara Medya Guneşî dide û dibêje ku ew kesên ku hatine girtin pîrê wan berê endamên DDKD'ê bûne.

Amnesty International bi girtina wan kesan telgrafek ji Serokwezîrê Tirkiyê Yildirim Akbulut û Mudûrê Emniyeta Diyarbekrê Aydın Genç re şand.

Xaçepîris

Amadekar: S. Rêving



b- peyva ku êşê, janê nîşan dide. 9- ard, arvan. b- de-warekî belek, reş û spî, li Efrîqayê dijî, dişibe keran (berevajî) c- pîrsiyarek (berevajî) 10- a- vexwarina serskî (berevajî) b- pronavekî kesîn. c- navekî jinan. 11- a- Bi soranî av. nexweşî, yan tiştê ji dê û bavandimîne. c- rengê spî ê bigewr. 12- a- ax, toprax. b- navê mehekê.

Serejêr: 1- a-Keç, yan kurê ne ji mêr, lê ji jina wî, yan ne ji jinê, lê ji mêrê wê (ji jin an mêrê berê.) b- şên, cihê jiyana lê heye. 2- a- xezal, ceylan (berevajî) b- kurê xuşka meriv (berevajî) 3- a- kesê ku bi riyekê diçe. 4- a- pronava îşarkî ya pîrjimar. b- mîrîk. 5- a- jiyana xwe bi rêve birin, "gêçim". b- berî du rojan. 6- a- pîrsiyarek (berevajî) b- li gund û lialiyê çîyan, ji bo hilgirtina nexweşan ji dara çêdikin. 7- a- "solê" hespan b- berhem, encam. Bi mena "kevîr" jî tê bikaranîn. c- pronavekî kesîn. 8- a- bi soranî "bilind" (berevajî) b- îşareta perê Swêd 9- a- mewekek b- Xuşka babê mirov (berevajî) 10- a- pronavekî kesîn b- Bi soranî "ufuq" c- Bi latînî navekî kuran 11- a- hilweşandin (berevajî) 12- a- yanî, anku (berevajî) b- dijûn, xeber, kufur.

Çeperast: 1- a- Di sala 1919' an de li qeza Madenê hatiye dinê. Li Maden û li Diyarbekirê xwendina xwe ya destpêkî û navîn xilas dike. Piştî serhildana Şêx Seîd û ya Araratê hukûmeta tirk pir zor-dariyê li malbata wî dike. Lewra ew û birayê xwe derbasî Kurdîstanê Sûriyê dibin. Di salên '60'î de li Bexdayê tê girtin. Piştî berdanê, tê Lubnanê î dest bi xwendina xwe ya bilind dike. Ji wir diçe Lozan û doktora xwe li ser sosyolojîyê distîne. Di sala 1949'an de bi hinek kurdên din re Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa ava dike. Di sala 1957'an de di gel welatperwerên kurd Partiya Demokrat a Kurdên Sûriyê ava dike û dibe serokê yekem ê vî partiyê. Di kovarên Hawar, Roja nû de dinivîsîne. Di 1972'an de bi keçika swîsî Gilberte Favre re dizewice. "Jiyana Min a Kurdî, yan jî Hawara Gelê Kurd" navê pirtûka wî a bi frensi ye. Ew 7'ê Çiriya Pêşîn, 1988, di 69 saliya xwe de li

Swîs, li bajarê Lozan çû heqîya xwe. 2- a- peyvek e, aciziyê xuya dike. b- halê emir ji lêkera "rakirin". (berevajî) 3- a- li gundan, cihê ku li ber çem cil lê tê şuştin, balav, kincşuştin (berevajî) b- qehreman, egîd. 4- a- demek ji rojê. b- cûreki pez. 5- a- kesê ne peyar, yê li ser piştê dewar-ekî. b- paşdaçekkek. 6- a- navê rojê heftiyê. b- îlac, çare. 7- a- sala çûyî, sala bûrî. c- sala ku em tê de ne. 8- a- giyayekî xwarinbar e, li çiya şîn dibe, pelên wî pan in, tîrş e û bi piranî bi xwê tê xwarin (berevajî)

Bersîva hejmara 104'an

Çeperast: 1-a) Dersim. b) ade. 2-a) ez. b) arvan. 3-a) wêran. b) êwar. 4-a) apolîtîk. 5-a) erd. b) rovi. c) eve. 6-a) meyav. b) hy. 7-a) oyek. b) qe. c) êk. 8) nr. b) eçamek. c) dû. 9-a) darp. b) mewij. 10-a) vî. b) oy. c) îmêd. 11-a) pasaport. b) rêş. 12-a) asîman. b) îb. c) ra. **Serejêr:** 1-a) dewlemend. b) pa. 2-a) ezê. b) re. c) ravas. 3-a) radyo. b) risî. 4-a) srax. b) ayep. c) am. 5-a) Norveç. b) apo. 6-a) ma. b) lo. c) kamyon. 7-a) avî. b) me. 8-a) avêtî. b) qewîtî. 9-a) dawî. b) hekîm. 10-a) enakey. b) jêr. 11-a) dê. b) dêr. 12-a) ba. b) Kerkûk. c) ş a

Li ser çiyayê Agriyê heywanên xeşok û heywanên ji cinsê beqan

Mikael Norström

Di sed sala 20'an de kesên ku interesa van ji bo heywanên xeşok hene berê xwe dan Tirkîyê. Ev nivîsa han li ser herêma rojhilata balkêş (Kurdîstana Bakur) a Tirkîyê ye

Em li Ixdîrê ne. Ixdîr ji behrê 800m bilind e. Dengê erebokên hespan, qamyona, peza, zîlên bisiklêtan û toz û dûman; tevlihevîyek ecêb heye li bejêr. Dema em berê xwe didin aliyê rohilata başûr em Agriyê ku heya asîman bilind bûye, dibînin. Agirî 5165 m. bilind e û li Tirkîyê bilindtirîn çiya ye û di dema Mezozoikum (250-260 milyon sal berê) de çêbûye. Agirî cara dawî di sala 1840'î de peşîya, Emê berê xwe bidine Agirî û li heywanên xeşok, req û beqên wê derê bikolin.

Em bi otomobîlê ji Ixdîrê derdikevin. Erdekî bê dar û bejî (di salekê de 252mm baran dibare) derdikeve pêşîya me. Em di riyek rast û dirêj de ne. Derûdora rê bi şiklên volkanî tije ne. Em ber bi jor ve diçin. Em li ciyekî ji behrê 1550m. bilind ji otomobîla xwe peya dibin. Çûkên cuda cuda li ser me difirin. Ji dûr ve pezên ku diçêrin xuya dikin. Ji vir heya serê Agriyê ku bi glasiyer e çend kîlometre ye. Dibe ku Nûh bi keştiya xwe li vir daniye. Dibêjin ku Keştiya Nûh hêj di bin erdê de ye. Hin perçê Keştiya Nûh mirov dikare li derekê li paytexta Ermenîstanê bibîne. Di vî nivîsara xwe de ezê tenê li ser çiyê ku niha lê me, nêzî 1550-1650 m. ji behrê bilind, rawestim. Min vê herêma Agirî di meha Gulana 1980'ê, 1985'an, 1986'an û di dawîya meha hezîrana 1988'an de ziyaret kir. Hevalên min herpetolog in û endamên Komela Herpotologî ya Swêdê ne.

Hewa (îklîm)


Li jorê hewa hênîk e û li vir ji bajêr zêdetir baran dibare. Ewrayî û şiloke li van deran adetî ye. Carekê jî zîpîkê-ku ji bo me surprîz bû- li me xist. Di taverojê de hewa him di mehên gulane him jî meha hezîranê de 20-25 derece ye. Lê ku ewrên qalind peyda bûn germî dikeve heya 10 derecan. Li Ixdîrê hewa di meha çileyê paşîn de -2,7 û di meha tîrmeh û tebaxê de 24 derece ye. Çiqas ji behrê bilindtir bibe hewa heqas sertir dibe.

Cografya

Bilindiya ku em lê ne, dişibe platoyê. Li teniştê zinaran, komikên kevîran û formasyonên volkanî, mîng û newal hene.

Hêşînayî

Giyayên li vî derê gelek xweş hêşîn dibin. Heta havînê giya di-



gihîjin heya nava mirov. Wekî din di meha gulane de li van deran gerr gelek hêsan e. Li van deran dar kêr in, bê çilo û dirrî ne. Gul û giyayên cur be cur jî hene. Li 1700m. ji bahrê bilind min sê çar komikên darên spîndar dîtin.

Di hin ciyan de xuya dike ku pez û çêlek hatine heya van deran û çêrîne.

Heywan

Min tu heywanên mezin ên bi çîçîk (bi guhan) nedîtin. Lê carna kûçîkên şivanan tîn dîtin. Di hus tiyê wan de toqek taybetî li dij guran heye.

Wekî din tiştê ku bala mirov dikşîne çûk û teyr in. Çûkên karakterîstîk zîrîrk, çivîka serreş, popelîk (çivîka Mêrga), zere serreş (çivîka mêrga), gewrik (çivîka zêviya), xapxapoka hêşîn (şiv xapînok), çivîka qeşaya hêşîn, kew kevoka qumrî, teyrîkê esîrê, xewreş (çivîkê dirîya) û hwd in. Dengê zîrîrkan carna guhê mirov dibin. Çivîka ceh (komsprav) wek her derê Tirkîyê li vir jî hene. Ji teyrên dirinde, sîsark (sîsalk, sKsalka gurî) û qertel (hulî, daraş, dal, teyrê keleşan) bala mirov dikşînin. Komikên biçûk ên eylo (qertel) carna li herêmê difirin. Çûkên din ku me dîtin qirakê şîn, sîsik, kevok in.

Heywanên ji cinsê beqê û yên xeşok:

Beqê bejî

Li ser Agriyê ji cinsê beqan me tenê beqa bejî dît. Ev beqa han mirov dikare li ciyê ku heya 2000 mîtroyî ji behrê bilind e, bibîne. Lê gelo ew li ku li ser hev siwar dibin û zêde dibin? Ava ku beqê lê "lîstîkên" xwe dikin ji vir ne kêrî 2 km dûr e. Îhtîmalek mezin e ku ev beqa han piştî "lîstîkê" terka avê dike û diçe. Beqê bejî ku mirov dikare li ciyên hişk û di bin kevîr û zinaran de bibîne li hember germiya bilind a tîrêjên rojê pirr debar dike. Xwarina beqan mîng û mûr, kurm û şeytanok e. Beqê bejî li başûra Swêdê, Ewropa, Bakura Afrîka û navça Asyayê heye.

Gumgumoka Kafkasî

Li vî herêmê bi çermê xwe yê

hişk gumgumoka Kafkasî heywanek karakterîstîk e. Gumgumok bi lez û bez e û mirov wan di dema xwe ji kevîrê hildikin kevîrê din, dibîne. Gelek caran meriv nagihîje ku wan bibîne, pirr zû ji ber çavan wînda dibin. Gumgumoka Kafkasî carna xwe ewqas zû hildike û davêje qulikên dar û zinaran û di van qulikên de asê dimînin û dimrin. Bi vî yekê xwe ji neyar xelas dikin. Dema mirov gumgumokê digre ew xwe li mirîtiyê datîne. Di nav destê mirov de qet nalive. Ev lîstîka han piştî ku mirov gumgumokê serbest dihêle, heya demek dirêj jî dom dike. Gumgumoka herf mezin ku me dît nêzî 0,5 mêtro bû. Xwarina wê bi piranî mîng û mûr in. Ji Rojhilata Tirkîyê (mebest Kurdistan e H. B.) heya deryaya Xezere belavbûyî ne.

Balîfka mara/Dêlemar

Mirov dikare bêje ku balîfka mara bervajîya gumgumoka Kafkasî ye. Balîfka mara bi piranî li bin erdê dijî. Zû bi zû nayê girtin û dema tê girtin jî dest bi rehetî dişemite û xelas dibe. Serê balîfka mara tûje ku di dema erdkolandin û çûyîna binî de jê re avantajek e. Xuya ye ev mar li Agriyê pirr tune ye. Me tenê yek dît ku wê li ser zinarekî ber rojê xwe dirêj kiribû û ji me reviya. Balîfka mara nêzî 20 cm. dirêj dibin û xwarina wan mîng û mûr in. Li Tirkîyê, Îranê, Iraqê û rojhilata bakur a Afrîka hene.

Marmarok/ Marîjok

Marmarok li her derê heye. Di dema piçûkayî de sê xetên reş li ser piştê wan hene. Dema mezin dibin rengê wan xetên reş dibin kesk. Nêzî 40 cm. dirêj dibin û xwarina wan mîng û mûr in.

Li Tirkîyê, Kafkasyayê, navça Îsraîlê û rojavaya başûr a Îranê hene.

Marmarokên zinaran

Lêkolîna marmarokên zinaran qet ne zahmet e. Herçiqas dema mirov dibînin direvin jî piştî bîsteke din li der û dora mirov diçin û tîn û mîngan digrin. Dema dikevin îstîrhetê xwe pan dikin da ku xwe bispêrin tîrêjên rojê. Marmarokên zinaran nêzî 20 cm dirêj dibin.

Li rojhilata bakur a Tirkîyê, rojavaya başûr a Îranê û li sinorên Sovyetê hene.

Marê Belek

Him li Tirkîyê û him jî li Ewropayê marmarokê herf mezin li Agriyê ye û marek belek e. Ev mar dişibe marê paxir (sifir, mis) ê li Swêdê, lê marê belek gelek dirêjtir e. Marê belek ê bê hestî heya mêtroyek dikare dirêj bibe. Me li Agriyê yek tenê dît û nêzî 25 cm. dirêj û pirr xweşik bi neqîş bû. Dema mezin dibin dikevin rengêkî. Gelek caran ku min wan girtiye kincên min qirêj kirine. Marê belek her tiştî dixwe.

Marên belek li rojhilata başûr a Ewropayê, rojavaya başûr û navça Asyayê hene.

Dûmahîk r.11

ne karê aqîla ye
lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

Di 9'ê Gulana 1980'î de Paul Geidset ji Beacon li DYA ji hefsê derket. Di sala 1911'an de ji ber kuştinê 20 sal ceza xwaribû. Lê roja ku ji hefsê derket 49 salan zêde di hefsê de mabû.

Piştî salekê (1912) ji ber nexweşîya ruhî, wî derbasî hefsa dîna kirine. Karbidestên hefsê piştî demek din ew ji bîr kirine. Di kontrola sala 1980'î de neheqîya ku li Paul Geidset hatibû kirin hat tespîtkirin û piştî dîagnosekê hat dîtin ku ew ne dîn bûye, lê ew bi qedera xwe razî bûye û tu doz li karbidestan nekirîye.

Şirketa Telefonê Bell a DYA ji bo qarta krediyê sistemê nuh dîtiye. Îro qartên krediyê bi kod tîn bikaranîn. Li gor sistema Bell wê qarta krediyê bi deng be. Xwediyê qertê berî ku qarta xwe tîxe qutiyê, koda xwe ji qarta krediyê re dibêje û pişt re jî dixwe qutiyê

bankayê. Qarta krediyê %99 dengê xwediyê xwe nas dike û di dema nexweşîya wek zekemî de jî %98 dengê xwediyê xwe dinase.

Laşê mirov ji materyalê pirr zexm pêkhatîye. Ji van materyalên herî zexmtirîn por e. Eger mirov por bihûne, mirov dikare pê trêne bikşîne.

Li gor Prof. Martin Seligman ji DYA, rewşa rojane ya mirovan tesîrek mezin li siheta mirov dike. Eger mirov di jiyana rojanê de pozîtîv(erînî) be hucreyên ku li dij nexweşîna şer dikin zêde dibin.

Eger mirov bikaribe sinyalên ku ji reh, ji dilavêtin û mesûlkeyan bi rîya hucreyên di çerm de top bike, mirov dikare bi van sinyalan aletêkî musîkê bi elektrîk bişixulîne.

Însanên ku pirr zû û bê westan dipeyivîn û ji alî kesên din tîn famkirin kêr in. Kesên wiha dikarin di deqîqeyekê de 300 kelîme bêjin. Spikerê BBC Raymond Glendening (1907-1974) carekê di 30 saniyeyê de 176 kelîme gotiye.

Fîşa abonetiya Armancê

- Salek
- Şeş Meh

Abonetiya salekê

Li Skandinavya	120 Skr.
Li Ewropa	50 DM
Li derveyî Ewropa	35 \$

Tarîx:

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişînin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiye û fîşa jorîn dagirin li ser adresa jêrîn ji me re bişînin.

Adres: P. Box 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden